# Qado Şêrîn

Çîrok

# Serok û Merok




31
Sema

# Serok û Merok

Çîrok

Qado Şêrîn

Serok û Merok

Babet: Çîrok

Nivîskar: Qado Şêrîn

Çapa yekemîn: 2009

Derhênan: Hozan Emîn

Karîkatorê nivîskar û bergê: Inayet Dîko

Weşanên: Dezgeha Sema Kurd ya Çandî û Henerî/ Dubey

(31)

www.semakurd.net

www.qadoserin.com

**Çavdan**

Nivîskara bi temen biçûk û xweşik û nazik Dilşa, mêvana hevala xwe Behiya xemgîn bû, li ber siya dîwarê mala Ehmed Wetenî rûniştibûn. Çi cara Dilşa ji Behiya re bigota:

-keçê porkurê ka em biçin hindur, şerme em wek parsekan li ber siya dîwêr rûniştine.
Behiya xwe giran dikir û digot:

-ka kêlîkekê biraweste lê, hindur germ e.

Dilşa jî nizanîbû çima Behiya naxwaze biçe hindur, lê nas kir ko Behiya tiştekî jê vedşêre, tako Hisênê Ferho diyar bû, bi diyarkirina wî re madê Behiya xweş û geş bû, xwîn pêve hat û sor bû, dema nêzîkî wan bû, çavên wî û yên Behiya ketin hev, çavê rastê ji Behiya re şikand, Behiya jî çavê rastê wek bersiv jêre şikand û bi şermî di ber xwe de keniya, Dilşa nû bi finasên Behiya agahdar bû, Behiya ko pirê dema xwe li ber siya dîwaran diborand, tepek lê da û bilez û bez bazda malê, li bayê rê jêre got:

-ne tu ji riya bavê xwe fedî nakî Behokê.

Dilşa a ko hîn nizanîbû çavdan çiye û tê çi wateyê, çû beramberî neynikê rawestiya, çavê rastê ji yê çepê re şikand, dît ko tiştekî xweşe, rabû çavê çepê ji yê rastê re şikand, dît ko hîn xweştire, ta bi danê êvarî, li ber rojava li ber neynikê mabû û çav li dû çav dida xwe, dema ji ber neynikê rabû û çû jî hîna çavan çav didan hevûdu, çû ber deriyê hewşê rawestiya, dît ko tiraktor û tirêlake tije blok ji aliyê rojava de tê û merovekî pêncî salî li ser blokan rûniştiye, dema çavên wî û Dilşa ketin hevûdu, Dilşa çavek jêre şikand, mêrê tozgirtî jî ji bo dilxweşkirinê her du çav jêre şikandin, Dilşa sor û şîn bû, bi şermî bazda hindur, û ji xwe re got:

-li min pepûkê, li min qirikê, li min şeşûkê, min çi kir, weyla Behiya xwedê rihê te bistîne û hew…

û ji wê rojêde çavdan tobe kir..

11/10/2006

# Mêrê Bizna spî

-Ez mêrê diya te me…
dema Kerîmo bi vê sixêfê li Rono vegerand min pişta wî girt, min di destpêkê de nizanîbû babet çi ye. Ez û wî li serê kulana mala me li hevûdu rast hatin, me pirsa hal û demên hevûdu kir. Ew hin caran xwe dikî lêkolînvan û digot hin deriyên girtî di dîroka me de hene gereke vebin. Bi nazikî em diaxivîn dema Rono jî tev li me bû û berî silavê bide, got:
-ha…mêrê Bizna spî çi rewşa te ye lo?
Matmayî min li herduyan nêrî û min di nava xwe de got, kuro vîya çi got lawo?.
Min Kerîmo yê weke kutilkekê ne dît ko hema bi her du destên xwe qirka rono dorpêç kiriye û dike ko wî bixeniqîne, weke qijnika ko bi pez bigre bi Rono girtibû, bi gelekî ji Rono kintirbû, qut û qelew û qalind bû. Dema cînaran ev yek dîtin wek birqê bi hawara min ve hatin, bi zor û heft bela her du destên Kerîmo ji qirka Rono vekirin, bû helkhelka Rono, ta ko bêhna wî vebû, xeber û sixêfek nema ko ji Kerîmo re neda. Kerîmo jî yê ko bi hêza du-sê xortan paş de vegeriya, got:
-ko ez careke din vê gotinê ji te guhdarî bikim ez tenê dizanim ez ê çi bi te û xuh û diya te bikim.

Min Kerîmo bi şekala serşokê li zankoya Helebê nas kir, dema em xort û ciwan bûn, me pir ji xwe hez dikir, dema me ji tira xwe re digot here bi wir de. Gelek kesan jê re digotin gerek tu wek me bî, lê wî bi serhişkiya xwe dawiya dawî bi ya xwe dikir û bi şekala serşokê diçû zankoyê. Di meydana zanîngeha wêje de weke pûtekî dibin darekê de û ne normal daniştibû, min çar-pênc caran bang li wî kir lê li min agahdar nebû, tu bang li kê dikî, çavên wî li ser keçekê ji horiyekê spehî û xweşiktir rawestiyabûn û her du destên wî di nav lingên wî de bûn, bêguman di xewn û xeyalê xwe de tiştin dikirin, dema ez di rûyê wî de daniştim dîsa bi min agahdar nebû, da bi her du destan û bi hemû hêza xwe min ew hejand û ew ji xewnerojkên şêrîn şiyar kir, bêhn çikyayî û weke marek pê vede got:
-heh…heh..çi heye..tu kîyî?
-Kerîmo…kuro çi bela te ye, tu çi bi xwe dikî ?
-yaho ma çaxê te bû looooo, tu gaveke din bihata hema, ooooh çi xweşbû, te çivîka min ji ser xefkê firand.
-kuro Kerîmo çivîka çi û halê çi?
Min mebesta wî ji çivîkê nas kir dema ko dikir xwe bilewitîne, dema min jêre got ko gerek tu herî pêre biaxivî û sozeke evînî pêre deynî baştirî ko tu wisa bi xwe bikî û xwe bixî vê rewşa ha de, bi ken û tinaz bersiva min da ko ew keçika spehî ne ji bo yên weke wî ye, ev horiya ha lê binêr spehîbûn ji kesîre nehiştiye, sed li sed hîn wê bi kesî re beşdarî di nivîna xewê de nekiriye, xweda ew ji bo kesên li jor daye ne ji bo feqîrên weke min, wî bîr nedibir ko ev horî jî weke wî bi can û rihe û ew jî vê yekê dixwazî. Dema min jêre got ko ez dikarim sozekê jê bistînim wî bahwer nekir û bi tinaz got:
-tu..?!
-başe, ko min sozek pêre danî tu dê çi bidî min?
-tu çi bixwazî…
-na, ez tiştekî naxwazim tenê nabe tu bi şekala serşokê bê zankoyê..
-me li hev kir…

dema ko çaxê soza min û wê hat Kerîmo jî bi min re bû, wî ji çavên xwe bahwer nekir lê paşî ko ez giham ba wê û me destên xwe xistin destên hevûdu, Kerîmo matmayî li min û wê dinêrî, min dizanîbû Kerîmo naka di nava xwe de çi dibêje û çi gumanan ava dikî, wî dizanîbû mêranî ji vê yekê re gereke û tepan li serê xwe dide ji ber ko wî ev yek nekir, jixwe li ser min naka dibêje ku ez jî ji kesên jor im û xweziya xwe bi ya min tîne. Kerîmo pirsî :
-ka bêje te çi jêre got ?, te çilo û çawa ew xapand?.
-tenê min got ko bavê min melyonêr e û ez kurê wî yê bi tenê me û rojê li naylonekê siwar dibim..
-lê bavê te parseke, lawo nan di mala we de tune...
dema Kerîmo wisa got horiya bîst salî ya ko destê min û wê hîna di hevûdu de bû wek çivîka ji xefk û davan azad bibe bi xeber û sixêf bezya min û weke birq winda bû, ev yek bû sedema ko Kerîmo cardin bi şekala serşokê bê zankoyê. Ji bo ko Kerîmo bikaribe û fêr bibe çilo û çawa dê keçkên spehî zem bikî min jêre şirove kir û got :
-kuro bê hişo ne wisa be keçik zû bi zû nayên xapandin û ko tu derewan li wan nekî ji te bawer nakin, tu derpiyê sor li ber serê xwe nabîni.
Min jêre diyar kir ko tu wisa nekî tu bi sêng û berên jinan şa nabî, ez ne yê pêşî me û ne jî yê dawî me ko derewan li jinan dikî, ko tu derewan nekî ew ji te bawer nakin û dê destên te di nav lingên te de bin ta û ta da tu xwe dawerivînî, ji bo tu dilê wê xweş bikî divê tu derewan jî lê bikî û ew ji derewan jî hez dikin û bahwer jî dikin, tenê dilê wan xweş bike, ji bo wan ne xeme dema tu dilê wan xweş û şa bikî, belê tu derewan li wan nekî tu nikarî avjeniyê di derya wan de bikî, ji bo tu karibî li avê siwar bibe divê tu bi fen û fûtên avê zanibî. Giyanê te dê birçiyê her tuştî bî ko tu ji laşê jinê bêparbî. Ji nişkande min pirsî:
-çi çîroka Bizna spî ye lo..?
-ji bo tu agrê di nava xwe de vemrînî û tu xwe vala bikî gelek awa hene, Bizna spî jî yek ji wan awaya ne..

Temoyê Xelefo û Mamedê Emîno di zankoyê de du xortên bi nav û deng bûn, cir xweş û bi qerf û tinazan hatibûn nas kirin, tevaya xwendevanên kurd ew nas dikirin, civata wan herdem lidarbû, nifûsa xwendevanên kurd li ba wan bû, ji bo ko tu merovekî nas bikî ger tu ji herduwan bipirsî, ji ko dibin bila bibin, ji Qamişlo, ji Dêrika Hemko, ji Koban û Efînê. Dema wan tiştin li ser Kerîmo bihîstin yekser bang li wî kirin û jêre ne razîbûna xwe diyar kirin û gotin ev yek di derheqa xwendevanên kurd e kirêtiyeke mezin e û qet nabî tu bi şekala serşokê bê zankoyê, bi şixte-şixta şekala xwe ya serşokê tu nerînên çewt li ser kurdan ava dikî. Lê dema Kerîmo guh li wan nekir û hatina zankoyê bi şekala serşokê berdewam kir, Temo û Mamedo ew vexwendî mala xwe kirin û ji hevûdu re gotin û soz dan hevûdu ko dê vê yekê ji Kerîmo re nehêlin. Herduwan bi hevûdu re xaniyek li taxa Siryan a kevn kirê kiribûn, wê şevê jî wek gelek şevan civat û gerîna peyalên meyê yên ko vala nediman, lidarbû. Temo ji nişkande got:
-delalno, Kerîmo dikî were...
-hêêêêê...bijî Kerîmo.., tevan bi hevûdu re gotin.
-ji pirsên min fam bikin û mebesta min jî nas bikin...başe..?
vê yekê şahî û kêfxweşî xist dilê hemiyan, wan dizanîbûn dê Temo afatan bîne serê Kerîmo û ew dê bikenin. Yek ji wan li dujî vê yekê derket lê weke wî nebû û jêre gotin ko tu dikarî tenê guhdarî me bikî an jî tu dikarî peyala meya xwe bi dawî jî neyne û here devera tu jê hatî. Pêşwaziyeke germ bi Kerîmo hate kirin, şekala serşokê li ber derî hişt û bi ken û payebilindî di sênga civatê de danişt, hemiyan peyalên xwe bilind kirin û gotin:
-noş...hêja Kerîmo.
Dema Kerîmo tuştek li ber xwe nedî dest avêt peyala avê û beşdariya wan di vexwarinê de kir.
-em Wiskî vedxwin..ma tê çi vexwî?
-ez jî wek we, ma hûn bi çi ji min çêtirin, em hemû kurê bava û simbêl boqa ne..

Temo û Mamedo ji zû ve li benda vê şevê bûn, bi hevûdu re li xwaringehê kevçiyek avabacana tev li peyaleke av kirin û baş tevdan û li ber Kerîmo danîn, bi hildana peyala yekem re Kerîmo ta nîvê wê vexwar, pêre pêre madê wî tirş û tal bû, lê tuştek negot, tenê destê xwe dirêj kir û kulmek fisteq û nok avêt devê xwe, bi bilind kirina duduyan re Kerîmo dibin de banda, dema rabû avekê birjîne ditewtihî, te digot qey denek Wiskî vexwariye û dest bi gotinên vala û beroçeqî kir:
-ooooooooooh…serxweşî çi xweşe, merov dike wek zarok û evîndaran..
-ma tu evîndarî ?, yekî pirsî.
Şev dereng bû û Kerîmo gula civatê bû, li ser zaroktiya xwe axivî û çilo li zarokan dida û çilo ji tirsa wî newêrîbûn ji malên xwe derkevin ko wî destûr nedabana wan, got çilo di şevên zivistanê de wî çîrok û serpêhatiyên kurdan ji zarokan re digot û çilo mirîşk digirtin dema mêvan dihatin, belê çilo Dîk bera hevûdu didan, wî got ko Dîkê wî zora hemû Dîkan dibir, berê pir ji niha xweştirbû, em zaro bûn me çûk û çivîk digirtin, ji nav koma zarokan xefk û davên min vala nediman, ma hun dizanin min çilo mirîşk dixapandin dema min pîvazeke spî dixist bin ji dêvla motkê ve, ma kê diwêrî bi kaban bi min re bilîze. Mamedo gotina wî birî û pirsî :
-diyare tu leheng bû di jiyana xwe ya zarokîde?
-erê weleh..çû ew dem nema vedigere..
-ka bêjin we di jiyana xwe de cins bi çi canewerîre kiriye?, Mamedo pirsî û peyala xwe ya dawî bilind kir.
Hemiyan ya xwe gotin lê ji wan re ne wek ya Kerîmo balkêş bû, dema dora axaftinê gihayê, wî got:
-yabo ew jî çîrok û serpêhatiyeke xweşe, de ka guhdarî bikin, temenê min 14-15 sal bûn, bizineke me yî spî û pênc-şeş mih hebûn, min şivantiya wan dikir, di newalekê de ji xweda pêve xuya nedikir, dilê min bijya bizna spî wek çawa dilê merov bibije Fatma Mixrubî. Kerîmo gotna xwe bi dawî nekir rabû çû destavê û bêhn çikyayî vegeriya civatê…
-niha tu ne ew ê ko dema jina tazî dît, dilê wî êşya û ew bi mirîtî avêtin xestexanê, ma raste tu heftekê di nexweşxanê de ma?, merovekî ji Kerîmo pirsî.
-ew e, ew bixwe ye, merovekî din wisa got.
-hema di şeva zewaca min de wisa bi min neyê lawo, bi xwedê ez ê bi hetikim.

Holenda
31/07/2003

# Serokkirîn

Kongirê partiyê yê di 20/09/2001de li gundê Nehroz lidar ketibû, vê carê ne normal bû, ne tenê ji ber ku piraniya nûnerên herêman amdebûn û yên jinan jî, belê vê carê ta bi nûnerên Zarokan jî amedebûn, kongir sê roj û sê şevan berdewam kir, axaftin di babetekê de diçû û dihat; çilo û çawa dê serokekî nû ji bo partiya xwe hilbijêrin..? da partiyê bi demê re bighîne û ber bi pêşxistinê de bajo, nûnerekî di gotina xwe de gotibû: partiya me ji ber partiyên dî ve gelekî li paş maye û ev jî wek tête diyar kirin ji serokê giştîye, diyar e em di hilbijartina serokan de nezan in, ya dî em kurd ji partiyekê tenê em serokê giştî dinasin, ew baş be partî hemû baş e û di xêra xweda de ye, xerab be jî partî hemû xerabe, hemû kar û xebat, pêşveçûn û paşveçûn li serokê giştî vedgere, di paş re nûner a jinan gotibû ku ji ber vê yekê divê em serokekî hilbijêrin ku milet hemû li dor xwe bidî hev.

Kongir sê roj û sê şevan dirêj kir, ta ko biryara dawî standin, geh axaftin sar dibû geh jî germ dibû, di çaxê bênvekirinê de jî hemû di vê yekê de mijûlbûn ji bilî Zarokan ên bi gogê dilîstin namaze nûnerê wan lîstikvanekî jîr û zana bû, fanêlekî zer lêbû, navê xwe û nemra 10 an li ser çap kiribû, bi wateya ko ew lîstikvanekî Berazîlî ye, di roja sisiyan de jî hîn ew ne axiftibû, navê wî di lîsta gotinbêjan de tunebû lê sikretêrê komîta navendî û liser daxwaza wî destûr da ku ew jî tuştekî bibêje, ji ne çarî hemiyan li wî guhdarkirin, wî got:

-**Di cîhana gogê(Footbol)de piraniya tîmên cîhanê wek Barşelona, Riyal Madrîd, Manişister Unaytid û Latisyo Roma rêzên xwe bi lîstikvanên biyanî xurt dikin, bi melyonên dolaran lîstikvanên baş û zana dikirin an jî kirê dikin da ji wan re bilîzin, vêga em jî dikarin serokekî baş ji partiya xwe re bikirin an jî kirê bikin** !!.Hemiyan bi mat li hevûdu nêrîn û gotin:

**-Bi xweda te tenê ya rast û durust û hêja got.** Endamekî wisa got û biryar bi vê yekê standin.Yek ji nav koma endaman rabû ser pêyan û bi dengekî bilind got:
**-Ez çavê te bixum, tu yê kê yî loooooooo, xweda te bihêle..?.**

Ev yek hîn di tevaya dunyayê de nebûye, helbet dê bûyer û nûçek hêja û rojanebe ji bo hemû rojnamegeriya cîhanî, partiya me wê ya yekemîn be ku vê yekê dike û ne dûr e ku partiyên dî jî vê yekê bikin, helbet dê wisa bikin da partiyên xwe pêş de bajon, kirîna serokan ji bo partiyên rojhilat zor gerek û pêwist e, hin ji bo li hev guhdar kirinê, hin jî ji bo demuqratiyê; **Ev serok dê me fêrî gelek tuştan bike ku ta niha em jê bê par in**, endamekî wisa ji xwe re got û pirsî:

**-Lê gelî hevalan ka hûn kê li ber çavan dibînin da em wî ji xwe re bikirin û bikin serok ?**

**-Ronaldo…**, zarokekî wisa û bi ken got lê kesekî deng nebir xwe, merovekî rîspî li kêleka wî ya çepê rûniştîbû jê pirsî:

**-Ew çi kes e û çi dike..?**

**-Mamo ew Berazîlî ye, di tevaya cîhanê de kesekî weke wî jîr û zana di gogê de nîne, lê pir buha ye haaaa!!.**

**-Çavê mamo em pirsa serokan ji bo partiya xwe dikin, çi çaxa me Kurdistan rêzgar kir em dê wî yê te got bikirin, bila ji me re bi gogê bilîze, te got navê wî çi bû..?.**

**-ez serok merokan nas nakim, ez tenê gogê û yê bi gogê dilîzin dinasim,** ê zarok wisa bersiva xwe da û bê deng danişt, di dema ku di nava xwe de pir aciz bû û digot çima ev kes li

ser gogê na peyivin ma ji siyasetê ne baştir e, ez dizanim çima ew li ser gogê napeyivin ji ber ew tiştekî li ser nizanin, ku zanîbana helbet dê biaxivyana da xwe qure bikin, ji bo ku li zarokekî weke min guhdar nekin li ser gogê napeyivin, wî bahwer nedikir çi çaxî kongir bi dawî bibe û bi gogê bilîze.

Nûnerê herêma bakur rabû ser kab û nîvekê û destekî xwe bilind kir, çi mirovê axaftina wî heba wisa dikir, da herkes wî bibîne, wî got:

**-serokê em bikirin divêt Ewrupî be, çimkî Ewrupî pir demuqrat û dilovan in û bi mafê mirovan re ne!!.**

Ji nav hemiyan rîsipiyek rabû ser pêyan û pêşniyarek da û got;

-her kes dikare navekî pêşkêş bike û di dûv re em dê wan navan daxînin hilbijartinê.

di dema ku pelik belav kirin û dan ser hev çar nav hatin meydanê, **Con Mîcer**, **Hilmot Kol**, **Nîlsom Mandêla** û **Bil Kilînton**, ji bo hilbijartina navekî ji van navan kongir rojeke dî ma, di heman demên dawî de ev pirsgirêk çareserkirin. Dema herçar navan deng wekû hevûdu anîn, **çar partî ji kongir derçûn.**

Holland -19/01/2002

***xelata yekemîn a kovara Zevî wergirt.**

**Qaşo ji hev hez dikin**

Dema çavên wî bi ên wê ket, ji çavên xwe bawer nekir, careke din lê nerî, dît ko pêre dibeşişe, kabokên wî sist bûn û ji qama xwe de hat xwarê, yekser dîlan û muzîk rawestiyan û xelekek ji merovan li dora cendekê wî çêbû, ji gelekan weyê mir, ji hinan jî weyê dilê wî êşya, hinan gotin; vî Newroza me têkbir, hinan jî telefona embulansê kirin, ji xwe di şeş deqeyan de polis û embulans li wir bûn. Tenê wê dizanîbû çi pêhat û çima wisa ji qam de hat xwarê, lê deng ji xwe neanî ta li ber barê hevûdu dîtin. Yekser jêre got:
-qey tu hîn ji min hez dikî?
-min berî niha bersiva te da, ma hez kirin wek merovan dimre.
-tu jî hatî van welatan û bûyî penaber?
- ji bo te, hemû ji bo nêzîkî te bim.
-te çilo dizanî ez li virim?
-min nizanîbû, min zanîbuwa dilê min nediêşiya.
-te Mem û Zîn anîn bîra min, wan jî hevûdu li Newrozê dîtin?
-Newroz derfeta hevdîtinê ye, ji bo hin dost û hevalan bibînim hatim cejna Newrozê pîroz bikim.
Ji bo ko gelek çav li ser wan nerawestin û got û bêjî çênebe, soza hevdîtina li xwaringeheke Çînî dan hevûdu û her du di nav milet de windabûn. Di ber xwarineke çînî re wî jê pirsî:
-tê bîra te me cara pêşî hevudu di imbara we ya genim de dît?
-na ne imbara genim bû, kadîn bû,
-li gor tê bîra min imbara genim bû, ji ber tu nebibû bi ka.
-belê ez bibûm bi ka, berî ez ji kadînê derkevim min xwe ji kayê dawişandibû.
-danê piştî nîvro bû û diya te çûbû ser tenûrê û bavê te li meletiyê bû.
-na, bavê min çûbû aş, û diya min çûbû bi hawara jina şivanê gund ve a ko dikir bizê.
-wê rojê birê te yê biçûk biser me de hat û em di rewşek xerab de dîtin,
-na, ew kurê cînarê me bû, li motka mirîşkê digeriya.
-te du gulî wek du keziyên mara hûnandibûn û bera ser milê xwe dabûn..
-tu caran min wisa bi porê xwe nekirye, dibe ko yek gulî li aliyê çepê be.
-wê carê min şekirekî keremêla da te piştî min devê xwe ji bin guhê te derxist,
-şekirê dilopiz bû, me bi deva dida hev û pêre te lêvên min dimijandin.
-eger tu zanî di dûv re min çi bi te kir?
-te xwestibû bişkokên sînga min veke, lê min nehişt.
-tiştekî bê bişkok li te bû, tu bê sityan bû û te hişt ez serê memkên te bibînim, min jî ji bo te gumlikekî reş li xwe kirbû.
-na, ne reş bû, ko reşbiwa dê ka lê xuya kiriba.
-ji bo tu bikenî min derpiyê te î sor kirbû serê xwe.
-devling bû, te ta bi serî kişandibû xwe, ez gelekî keniyabûm.
-şanikek reş di bin serê memka te ya çepê de hebû.
Piştî ev yek jê guhdarî kir, li gel ko gepek xwarin di dev debû, lê yekser çû destavê, di rê de gepa di devê xwe de cût û bê mad ji destavê vegeriya, xwarina pêre bi dawî neanî û bi xeyd ji xwaringeha çînî derket.

25/11/2006

## AX KO PERÊ MIN HEBANA

Aaaax....ko perê min hebana, min ê çi kiriba û çi nekiriba, weleh min ê dunya li ser tilihekê bizîzikanda, min ê bihişta ko dunya paş û pêş bigere, min ê destên xwe bidana ber rokê û min nedihişt bête der, lê ez çi bikim "mentelî" di bêrîka min de tune, ez jî dibêjim ez zilam im, tu dikarî werîsekî ji boqê simbêlê min çê bikî, min li ser piştê paldaye û ling daniye ser ling hîn ez dibêjim çima perê min çênabin, lê ma ko xweda niha di wê kuleka vekirî re ya wek mala kevokan çewaleke pere ji min re bavêje wê çi bi wî were, helbet ne pê perîşan û ne jî feqîr dibe, lê xweda tu carî qenciyên wisa bi perîşanên weke min nake û ne jî ji perîşanên weke min hez dike, hin dibêjin li wê dunyê wê xweda her tuştî bide merov lê ko ew dunya tunebe me {.......} xwar.

-Aaaax.....ku perên min hebana...min dê qayîş bi Mafya û serokên welatan re bikişanda û bila îca ên weke Hitler û Mosolînî bi hatina şerê cîhanê bikirana û bila ên ne demoqrat wek serok û rêberên welatên Ereb û musulmanan serokatya welatan bikirana, wê çaxê dê xelkê bi serê min sûnd bixwara û ez bi tiliha şanî hevûdu bidama, min ê bihişta ku masî bê av bijîn, lê ez çibikim hema aaax û sed carî aaax ko perê min hebana, ezê ne ez bama, ezê derbasî hemû civat û deveran bibama û hemû merovên rûniştî wê ne wek xwe ji ber min rabana, ji wan weyê ko minê destê xwe yê germ bida wan, lê min ev yek ne dikir û min ew bi vî tuştî şa ne dikirin û min ne dihişt bihingivin min jî, ew yên ko ta doh nedihiştin ez li nav şekalan rûnim û ezê di sînga civatê de rûniştma, min dê bihişta berê tevan li min be û min dê dest bi çîrok û serpêhatiyên xwe bikra; îro xort û keçekê hevûdu revandin û xwe avêtin tor û bextê min û min dawa wan safîkir, min her du teref li hevûdu anîn û min nextê keçkê pêncsed hezar da bavê wê di gel ko wî dused hezar tenê dixwest, doh jî çend mêr devê wan ji boqê simbêlan xuya nedikirin wek çûkên qefilî xwe avêtin mala min û nema ji pişt dergûşa kurê min rabûn, min ji wan pirsî:
-kuro we xêr e...?
-em di tor û bextê te de ne..em dexîlê şeref û namûsa te ne...em kûçkê tene, tê me biparêze..!!
-ê erê kuro we xêr e, we çikiriye...?
-em û gundiyên xwe pevçûn û bi xwedê me çendek ji wan kujtin, ji ber ko kera wan ketibû nav zadê me!!.
Bi xwedê min ew jî li hevûdu anîn û min xwîna her çar mêrên kujtî jî milyonek û sêsed û çil û neh hezar dan merovên kujtiyan. Doh na pêr jî dengê hawar û qêrîna cînarna me dighaşt asmanê heftan, min bi xwe ew bir nexweşxanê ta ko za û keçek jê re çê bû û ji bo vê alîkariya ko min pê re kir cînara me sûnd xwar û got: -bi kîrê mêşê tu dê nav lê bikî yan ezê wê bixeniqînim, rabû min navê wê kir Şeşê.

Wisan min ê çîrok û serpêhatiyên xwe hemû bigotana, ma kê dikarîbû gotina min bibiriya û helbet kesî ji civatê ne diwêrîbû rabe û ji civatê derkeve ta ko ez lê bama, derengî şevê ezê rabama wê ên mayî jî teka-teka bidû min de derketana, min dê wek libên tizbiyê bi wan bilîsta, lê ax ji kerbê mirinek bê minet re, ma ez jî dibêjim ez sax im, hatina min î vê dunyê şaşiyek mezin têde heye yan ez ne di çaxê xwe de hatime û ji bo ko perê min tunene şer û ceng ji dunyê qut nebûne û nabin jî...Aaaax...ko perê min hebana..

Min ê jineke xwe anîba ko temenê wê ne di ser yazdeh salan re ba û xweşik, xweşik û xweşik ta ko tu bêjî xweşik, divabû xweşikbûn ji kesî re nehiştiba, divabû ji heyv û rokê re

bigota herin bi wir de hûn çuqasî ne xweşik û kirêt in, lê ez ê çima tenê jinekê bênim, çima ezê nekim didu û sisê û çar û pêc û şeş û heft û heşt û neh û deh û yezdeh, madem pereyên min hene-hene ma ezê çi bi wan bikim, û divê yek ji ya din xweşiktir û bedewtir be, divê yek ji ya din re bêje here bi wir de tu çuqasî ne xweşikî, kê ew biditina ji xwe re bigotina; xwezî min carekê di vê kuta û bila tayê kirasê min tune biwa. Lê çima ezê nekim sisê yan jî çima ezê nekim çar jin madem perê min hene-hene, ma ezê çi bi wan bikim, qene ezê wan bi xwe re bibim gorê û xweda jî ev tuşt helal kiriye ezê yekê bênim û ya din berdim û ezê şevê bi sîng û berê yekê şa bibim û ezê bibim bavê 80-90 zarokî da ko di tevaya cîhanê de merovekî weke min tunebe, û dê navê min bi firehî bikeve pirtûka Genis, lê aaax û sed carî ax ko perê min hebana...min ê qesir û qonaxên xwe bi ser minara mizgefta mezin bixistana û min ê dora wan bikra gulîstan û darên mêwan û min ê ji hemû modêlên turumbêlên nû li ber deryên wan birawestandana, lê ez ê çi bêjim û çi ne bêjim lingên min li ser hev qurumîn û pişta min bi tejik ve zeliqiye ji vê sibê de lê ax-ax, hema tifû li vî welatî be û hew, welatê ko nikaribe xewnên mirovekî weke min pêk bîne ma ew jî welat e? hema bi xwedê gerek merov vî welatî bifroşe, vî welatê kirêt û bêkêr, welatê ko merov nikaribe têde û di mala xwe de ji dil carekê bikene û merov nikaribe di jiyaneke dirêj de bibe milyonêr, ma ew jî welat e?
Ev hefteke wisan bi serê wî hatiye, bûye girtiyê malê û kûr diponije, geh jî bi xwe re dipeyive, ji nişkan de rabû ser xwe û di derî re derket, lezand ta gihaşt ba solfiroş û jê re got û pirsî:
-Tu vî welatî nakirî..?
Bû tîq-tîqa solfiroş û destên xwe ji ken li hev dixistin, dawî û paşî têr kenya jê re got:
-Wê kî mala xwe xerab bikî vî welatî bikirî tu dibînî yek sola vî welatî di nav van solan de nîne, kesek wan nakire, heyvekê li xwe nakî dibin yên avêtinê.

welatfiroş pişta hustê xwe xurand û derket, berê xwe da cilfiroş û jêre got û pirsî:
-Ez qurbana te me tu vî welatî nakirî..?
bû tîq-tîqa cilfiroş ta ko zikê wî ji ken êşiya, dawî jê re got:
-Wê kî mala xwe xerab bikî vî welatî bikire looooo...te serê min xwaroooo...tu dibînî cilên vî welatî hemû toz û gemarê girtiye ser wan çimkî kesek wan bazar jî nake, heyvek di ser wan re nare dibin ji bo sol paqijkirinê.

Careke din welatfiroş pişta hustê xwe xurand û di derî re derket û berê xwe da dermanfiroş û jê re got û pirsî:
-Tu vî welatî nakirî..?
Ji ken zikê wî êşiya û hêsiran di çavên wî re avêtin, dendikek xwar û ji welatfiroş re got:
-Welatê ko dermanên wî hemû di şûşên xwe de xerabe û genî bin wê kî mala xwe xerab bikî wî bikire.?

Careke din welatfiroş polîpoşman ji ba wî jî derket û berê xwe da rojnamevan yê ko pirtûkxana wî di anîşka kolana navenda bajêr debû û jê re got û pirsî:
–Tu mirovekî zanayî, ma tu vî welatî nakirî..?
-Welatê ko nehêle ez bi serbest û azad binivîsim ezê çi bi wî welatî bikim!!.

welatfiroş ji ba wî jî derket û berê xwe da gulfiroş:
-tu vî welatî nakirî.?
-welatê ko gul û geya lê şîn nebin tu xêra wî welatî tune ye..!!

Hingî ko welatfiroş westiya çû çayxanê rûnişt û çayek vexwar bi vexwarina çayê re kûr di ramiya, gelo wê kî vî welatî bikire, dagîrker nemane dê wan kirîba, ji nişka de serê xwe rakir û bi dengekî bilind ji yê çayxançî re got:
-Tu vî welatî nakirî?

-welatê ko tu nikaribî çaya wî vexwî û miletê wî çaya biyanî vexwî ma ew jî welat e? û ji bo kirîn û firotinê qet nab e.!!

Welatfiroş naskir ko kesek welatê bêkêr nakire û ev ger û xebata wî tev vala û bê sûde ye ji ber ko wî kesek nehişt ko welat pê re neda ber bazar û firotinê lê kesekî bazara kirînê jî jê nekir, da ji hêrsa di nava xwe de keserek kişand û yek berda ta ko yên rûniştî tevan dev ji pelkên lîstikê berdan û lê meyzandin, çav di nava serê wî de sor û zerdoq bûbûn wek du xaran û di nava serî de çûn û hatin û bi dengekî bilind ta ko jê hat bang kir û got:
-Aaaaaax ...ax ko perên min hebana...
yê ko li kêleka wî ya çepê rûniştibû simbêlên zer ji dûyê çigaran ji ser lêvên xwe dan alî û jê pirsî:
-Ko perê te hebana te ê çi kiriba.?
-Aaaaax...ax ko perê min hebana min ê serokek kirîba û li ser serê vî welatî danîbana belkî em jî kiribana merov.

**Qamişlo**

25/11/1993

# Boxê Birîva

Dema berê Boxê Birîva ket çiyê, miletê kurd hemû bê mad û bêzar û sernixûz bûbû, ji bilî her yazdeh girtiyên zindanê, yên ku nûnerîtiya komîta navendî ya partya Şoreşger û welatparêzên kurdistanê dikirin, ew di civîneke dîrokî de bûn dema leşkeran girtibûn ser wan, berî ko bêne girtin û di destpêka karê xwe de endamê nemre çar gotibû:
-hema xweda bikî ev civîna dawî be lawo..Weleh em helikîn bi van civînan re, kabokên me sist bûne ji rûniştinên pir û dirêj.
Dema wî endamî wisa ji endamê nemre pênc re got ê ko li kêleka wî a çepê rûniştibû, wî lê vegerand û got:
-yê min qûna min bi tejik ve zeliqiye tew ez nema dikarim rabim.
endamê nemre sisê jî ê li kêleka wî a rastê rûniştibû serê xwe du-sê buhustan dirêj kir û li wan guhdar dikir, dema herdu nema peyivîn wî got:
-hûn dizanin ev civîna çenda ye..?
-na weleh em nizanin..me ne jimartiye..
-ez benî ev bû “”7211”” civîn
-û ta niha jî me tiştek bi ser tiştekî nexistiye.
-ji îro pêde heval ji îro pêde, endamekî wisa got.
Her yazdeh endam matmayî mabûbûn û nema dizanîbûn kî dê kela dilê wan hênik bike û wan bi kurdistaneke serbixwe û azad şa bike, ji ber ko Ferwerên dagîrkerên Kurdistan bi Netweyên yekgirtî re gihaştibûn biryarekê û ji wan re bi rê kiribûn ko “Hîmekî mezin  mîna latekî li felan deverê heye ko merovekî kurd bikaribe wî hîmî hilgire ji wê deverê ta devera karibe bighêjê dê ew kurdistaneke serbixwe û azad be, pîroz be li we û em ê jê vekişin”.
Ji ber vê yekê her yazdeh endamên partiyê li serê xwe didan û digotin:
-gepa herî xweş hatiye ber devê me lê em nizanin çilo û çawa bixwin.
hemiyan serê xwe berdabûn ber xwe û diponijîn, çixare ji qûna çixarê pêdixistin, yê vî alî yê wî alî ji dûmanê nedidît, yekî di ber xwe de got:
-aaaax..Rustemê Zal ku tu sax ba..
Endamê nemre şeş meyzand ko li bîra wan kesekî wisa nîne ta ko ne deng ne jî pêjna mirovan ji wan nedihat, wî got:
-Şêro..yê bêvil mîkutî..
tevan serê xwe berjor rakirin û li endamê nemre yek meyzandin dema wî bersiva wî da:
-ew nikare zuxurekî hilgire..
-li ba min merovekî wisa heye..!
bi lez tevan lê nêrîn û pêre pirsîn,
-ew kîye gidî..bi lez bêje..?
-Elîkê Betê .
-Ho..hooo, ma em civiyane ko em tinazan bi hevûdu bikin û bi hevûdu bikenin
-Ew bi fen û fûtan xurte, dikarî fen û fûtan li cinan bike lê ne li keviran.
Endamê nemre yazdeh destê xwe dibin çena xwe vekirbû û ji dil diramiya, qurtek av vexwar û ji nişkan ve got:
-Gelî hevalan kurdistan rêzgar bû, bese ta niha bindestî.
-Bese looo..!!
nizanim kê wisa got, pêre çavên hemiyan beloq bûn û ziq li endamê nemre yazdeh meyzandin û bi hevûdure pirsîn:
-Çawa..kî ye?
-Boxê Birîva ..!!
-Boxê Birîva…!!, hemiyan bi hevûdu re navê wî hildan û gotin.
-wê çi teba be ev yaho.., ji nav koma wan nizanim kê wisa got.

-Hahew..hahew..yê ew ne dîtiye çi ji xwe re dîtiye..
Civîna wan bû kêf û şahî û dîlan, her endamekî tiştek dikir, ê dilîland, ê dîlan dikir û hinan jî bang dikirin û digotin:
- Gelî hevalan ka werin em alê hildin..
-ezê bibim wezîrê karê derve belkî ez têr bigerim û welatan bibînim, bi vê gotinê re destên xwe bi hev dixistin û difirkandin.
-Kuro lawo kurdistan rêzgar bû…kurdistan rêzgar bû.. ezê xwe ji kêfa bikujim, ma kê bahwer dikir ko rojekê ji rojan kurdistan azad bibe.
-Gelî hevalan..gelî hevalan birawestin ta niha tiştek nebûye, de ka wer in em bişînin pey Boxê Birîva bila bê û dest bi meşa afesanî di bin hîm de bike paşê em dikarin kêf û şahiya xwe bikin.
Yek nekirin didu şandin pey Boxê Birîva û her yazdeh endam li dora wî bûn xelek, matmayî lê temaşe dikirin, te digot qey merovên wisa gir û dirêj nedîne, endamê nemre yazdeh got:
-Box..rihê min..kezeba min..çavê min, îro roja te ye, îro miletê kurd hemû çav li te ye ko tu tiştekî jê re bikî.
endamekî gotina wî birî û got:
-Em ê pûtekî mîna çiyayekî li meydana Çar Çira li kêleka Qadî Muhemed ji te re çêbikin.
Box lê zîvirî çimkî li paş wî daniştibû û jê re got:
- min ev tişt hemû navên, ez pir kêfxweşim ko ez dikarim vê yekê ji miletê xwe re bikim.
Endamê nemre deh gotina wî birî û got:
-tu heya bi toto jî neraweste ha..
-ez pir spasiya dê û bavê xwe dikim ko ez wisa hatime dunyê.
hemiyan jê re li çepkan dan û ew li Turumbêleke ser vekirî siwar kirin û berê wî dan hîm ê hêviyê, piştî Turumbêl bin kaş bû Turumbêla leşkeran li ber derî rawestiya û destên her yazdeh endaman xistin qeyd û kelemçan de û berê wan dan hebs û zindanan. Dema Box gihaşt ser kevir gelek kes li wir di çavnêriya wî de bûn, Nûnerên dagîrkerên Kurdistanê û Neteweyên yekgirtî, televezyon û rojnamevan ji hemû welatan li wir bûn, hemiyan rê jêre vekirin ta di ser hîm re rawesta, lê meyzand, li dor çû û hat, destê xwe dibin hîm re hilda û danî, çû ji aliyê din de hilda û dîsa danî, pişta xwe rastkir û li hemiyan nerî, kesên mad tal bala wî kişandin, laşê xwe bi çend bizavan germ kir, nûnerê Neteweyên yekgirtî ber bi wî de çû û jê pirsî:
-Tu amadeyî..?
-Belê…
-De hîm hilgire û ber bi başûr de bimeşe.
Careke din Box di ser hîm re rawesta, li ser kab û nîvekê herdu destên xwe dibin hîm vekirin, hêdî-hêdî ta rabû ser pêyan, pêre hêdî-hêdî destê xwe yê rastê ji bin hîm kişand ta di ser re rawestand û li ser milê xwe yê rastê danî û dest bi meşê kir, Turumbêl bi dû de bûbûn rêz û di ser serê wî re jî balefirên Helîkopter. Rojekê duduyan Box ne rawesta, belê bi mehan ne rawesta, dibin kevir de nan û av dixwar û vedixwar, ne westa ta ko berê wî ket çiyê, hemiyan di nava xwe de digotin aniha dê biweste û dê kevir deyne, lê Box çiya jî derbaskir û ne rawesta, li paş xwe nerî dît ko gelek kes matmayî û çav beloq mane, wê nûnerên Dagîrkerên kurdistanê çibikin ta ko wî bi rawestînin, êdî jê re gotin:
-Bese Boxê Birîva bese..ta vir besî we ye..ma tê dunyê tevî bigrî..??
Box li wan jî ne nerî û her ew dibin hîm de dimeşiya. Nûnerên Dagîrkerên kurdistanê bi gelek awayan kirin dako wî bixapînin û rawestînin lê tiştek bi ser tiştekî nexistin ta mirovek ji xwe rêkirin ba endamên partiyê, wî mirovî ji wan re got:
-ko Box neraweste hun ê di zindanê de bimînin ta û ta.
hemiyan li hevûdu nerîn û ji nişka û bi dengekî bilind gotin:
- bila raweste..bila raweste, em mirin di vê zindana teng û tarî de..

11/01/1994.Qamişlo

# Kortik

-Ezê çawa bikim ji vê jinê "ya rebî ya îlahî"..
Ji ber ko debara min nema ji ber destê wê dibû ez wisa mabûbûm min keser û xem dihûnandin û berzûrî Xweda dibûm:
- Ya rebî ez kûçkê te me min ji vê qereçiyê rihet bike.!!!

Helbet, min di nava xwe de wisa digot, ma min diwêrîbû tuştên di nava xwe î peritî de derxim der û eşkere bikim, li gel vê yekê jî ko ez di rûyê wê de rûdiniştim min dikir ko hes bike ko ez gelekî jê hez dikim, geh bi devlikenekî mebestî û geh bi mad talî.

Ko merovan tinazên xwe bi min nekiribana û negotana ne tu zilam e, çimkî ji ber jina xwe bazda, min ê dev ji vê malê berda û min ê konikek li çol û çiyan vegirta û ezê tê de rûniştama, ji ber ko her roj xwarina me bi ya wê bû, ev bû yazdeh sal ko em bi hevûdu re dijîn, rojekê ji rojan xwarin bi dilê min li êgir ne bûye. Her roj jî xwarina me kortik bûn û ji bo wisa jî şerê me her gav lidarbû, min jê re digot:

-Ez berê wek kortikekê me û tu her roj jî kortikan çêdikî...
Bê ko li min meyzîne û ji ber ko zire gepek di dev de bû û di her destekî de jî kortikek hebû da di ber devê xwe re bighîne, tuştek ji min re got min qet jê fam nekir, piştî gepa xwe daqurtand got:
- Tu kortikeke ne dagirtîye.. ji bo wisa jî rih di te de tune, pepûko hema bux û bux û bux belkî rih bi te ve bê..tu bûye weke darkê fisê..

Min navê wê kiribû Kortikê. Cîranan jî qet kortik çênedikirin, tenê bes bû ko di ser dîwaran re bang bikirna:
- Wa cîrana kortikê.. tu ka bi xêra dê û bavê xwe çend kortikan welê..
Ta ko merov çawa bi meyzanda serî û dest û sênî di ser dîwarên mala me re bûn û dibû qîj-wîja wan û bang li xanima min dikirin:
- Wa cîrana Petotê.. tu ka bi xêra dê û bavê xwe çend kortikan welê..
- Wa cîranê Xwedê te ji kortikan bê par nekî ka vê teştê ji me re tije kortik bike lê..
- Wa cîranê Xwedê kurekî bide lawê xaltîka te, welê van sêwlekan em xwarin ji bo kortikekê, tu ka vê beroşê çendeka bixêde lê..
Kortikê, ango jina min, gelek caran wisa kortikên me didan cîranan ta ko bêtirînên caran bê kortik dima û bê ko ji wan tam bike, ji nûv re û careke din radibû bermîlek kortik li êgir dikir, yê min jî tiq-tiqa min bû ez bi wê dikeniyam û bi tinaz min jê re digot:
- Kortikêêêêê.. Di heqê te de ye..weleh te em li dinyê û axretê hetikandine.
- Kortikêêêê.. tu çima kortikan nafiroşî..?.
- Ha ho.. weleh te anî Kortikê..

Di ber xwe de min wisa digot û di vê babetê de bi ken û ji dil ez ramiyam û ji nû bayê heza Kortikê li dilê min da û bi destan min şanî wê da ko were li kêleka min rûne, min dest danî ser milê wê û bi kêlekekê min lê meyzand, bi ken min jê re got:
- Zerîcanê (navê wê) em çima firoşgeheke kortikan venakin..?
Lêvên wê ji ser hev çûn, bi ken û bi teniştekê li min meyzand bê ko tiştekî bibêje, dîsa min peyva xwe berdewam kir:
- Îş û kareke ne li bîra bilîmet û hozana ye..
Bi çav in fireh li min meyzand û tiliha xwe danî ser cênîka min, pê re got:
- Qoq hene û qoqanok hene..

Dîsa min jê re got:

-kesên ko bivên kortikan bixwin wê wer in ba me kortikên amade bikirin, çima dê xwe biwestînin ta ko bikolin û dagrin..

Gotina min birrî û got:

- Naaa... amade hene.. xelk dixwazin amade gepa wan bikeve devê wan..
- Û çuqas Gaza wan dire..
- Hiş .. hiş dengê xwe hilmeke, nere kesî..
- Qoq hene û qoqanok jî hene..

Ne min ne jî wê me bawer nedikir çi çaxî em ê dest bi vî îş û karî bikin, di eynî gavê de em rabûn bi bajêr û çarcihan ketin, yazdeh çewal bacanên reş mîna bênderekê me li hewşê kom kirin, ji dermanan re bacanên reş li bajêr nemabûn, şeş qîzên karker ji yên ko ji neynikan hez nakin me li xwe civandin û me dest bi kolanê kir, Ya dinî rojê kolan bi dawî hat û ji kêfa di nava xwe de min destên xwe bi hevûdu dixistin û min li çepka dida û li dor bermîlên ko bûbû peq peqa wan di bin agir de, ez mîna dînekî diçûm û dihatim, min dîlan dikir û bi stranî jî digot:

Zerîcanê .. Zerîcanê
T'û kortik wer in dîlanê
ên hez dikin kortika
wer in mala beytika

Me qapan danî û em li ber rawestiyan, gavekê duduyan, katijmêrekê.. danekî, rojekê, ya dinî rojê tu kesî li derî neda, çavên me di bendemana merovekî ko bazara kortikan bike, westiyan, bi mat min li Zerîcanê nerî, wê li min nerî, bi madekî tal min jê re got:

- Kortik bûn bi pera.. Çavên me man li dera.!!.

Ta ko kortikên me di bermîlan de genî bûn û bîna wan fûriya û belav bû, ta ko bi tarê û bajêr ket, ta ko gelek kes ji bîna wan nexweş ketin (tenê Textoran sûde ji vê yekê wergirtin) û çendek ji nexweşan jî mirin, cînaran nema debar ji ber bîna genî kirin, piştî zirt û fortan gilihê me kirin û bû tûti-tûta turumbêlên polisan li ber deriyê me, matmatyî min li Zerîcanê meyzand û bi piste pist jê re got:

- Îca çû ji me de lê Pepûkê...

Hîn wisa di wê rewşa xerab de neh-deh leşker borîn û bê ko tuştekî bêjin bi çeplê min girtin û ez wek sehekî mirî bi dû xwe de kişkişandim, di nav wan re û bi zor û heft bela ez li Zerîcanê zîvirîm û bi dengekî hêla û şewat min jê re got:

- Kortikê anha têr bixwe..
- Kortikêêê.. Ez çûm bi xatirê te..
- Kortikêêê .. tu mêra di paş min re nekî ha.. li bende min bimîne.

Di nav lepên leşkeran de dîsa min strana xwe di ber xwe de got:

Zerîcanê .. Zerîcanê
T'û kortik wer in dîlanê
ên hez dikin kortika
wer in mala beytika

Bi stranê re ez wek sehekî avêtim dawiya turumbêleke kesk ta ko min nema xwe dît.

Dema ko Zerîcanê hat seredana min zire beroşek kortik bi xwe re anîbû lê min tam nekirin, dema girtiyekî li sedemê pirsî, min got:

- Ko ez li wan dimeyzînim marên reş tên ber çavên min..

**Qamişlo**

# Ax ji derdê mêrekî

-Xwedêyo…ma min çûkên te peritandibûn, te ev yek anî serê min, bawer bike nema diqede, bê mêr nema diqede, piçekî li rewşa min jî binêre, yên ji min piçûktir mêr kirin û zaroka wan ya mezin bûye bi dirêjbûna min, lê ez pepûka xwedê di mala bavê xwe de mîna pîrejinekê pîr bûm.
Bi van gotinan Narîn her roj yazdeh caran berzûrî xweda dibû û her carê jî berzûriya xwe bi kufe-kuf û axîn bi dawî tanî :
-îro jî çû û kesekî ez nexwestim .

Ez jî ne xwezî bi wê roja min ew nas kir, rojek reş bû di jiyana min de û qet ji bîra min naçe, rojnan ji min ve mîna bûkek lastîkî bû hingî xweşik, bedew û li hevhatîbû, lêvên xwe mîna kulîka nîsanê sor dikir, hinarkên rûyê xwe dikir mîna pelên gulan û porê xwe dikir mîna Birc Êvil da ku piçekî di çavên merovan de dirêj xuya bibe, dema min ew wisa xweşik û bedew didît min jê dipirsî:

-**Van rojan tu ne îş weşike...çi bela te ye**?!, dibin çavan re bi kêlekekê û bi kenekî lib-libî li min vedigerand:

**-hesta şeşa ji min re dibêje van rojan wê xortek bê te bixwaze û bi rastî jî berî sê-çar rojan min di xewde dît ez bûk bûm lê bê berbû û kilîl û zave**.

Carna jî min ew didît dilê min ji hemû jinên dinyayê dixelya û nava min li hev diket, her wisa dilê min ji keçkên dinyê tevan sar dibû, min dê û xwîşk û cîrana xwe ya xweşik ji bîr dikirin û kirêt didîtin, wê gavê min dixwest ez tune bama, yan gornebaşekî li nava mezela bama, yan jî bi carekê re ne hatama dunyê, lê dara xweziyan ber nagre, bi madekî tirş û tal bê ku ez lê meyzênim min jê di pirsî:

**-Ka qey hesta şeşa derew kir..te îca çima xwe kiriye mîna pîrhebokan.**

Ku merov ew di vê rewşêde bikira meymûna sersalê dê merov çewalek pere bida hev, wê jî wisa ne diwêrîbû li celd û kolanan bimeşe çimkî zarokan didan dû û tinazên xwe pê dikirin, wek bi dînan bikin û wisa digotin:

**-Dêhnê..Dêhnê ..Dêhnê ..ji derdê mêrekî re dêhn bûye..Hêlekê...Hêlekê...**

Bi koman zarokan didan dû tanî ew dixistin mala bavê wê, ji lez û bezan re çîmkên wê yên mîna darikan li hev diketin û diherbilî, tanî ku dighaşt mal sê-çar caran dikulmişî û diket, dibû bi herî, dibû bi toz û terabêlk da ji zarokan rêzgar bibe û bighêje malê, lê zarok ji dû wê venedigeriyan.

Narîn jî baş û têra xwe nezan bû, ji kerbê mêrekî re mirîbû û tu xebata hêja ji bo hêvya xwe ya ku ji bo wê ranediza, nedikir, tu şêwe û awa li ba wê nebû ko xwe di hustê xortekî rake û xwe jê re bikî jin û bermalî, di dema dawî de bi awayekî pêşketî û şaristanî xwest ku mêrê pêşerojê bibêne dema rahiştibû bihîstoka telefonê û heman wisa li nemrekê dabû...ev nebû yê din-yê din nebû yê dinî din..ma çawa çêbû .ma xela mêraye, weleh kes di mala bavê xwe de wisa nemaye, hema ev bext reşî bi ser serê min pepûkêde teqiya, çi nîska min fûriya û girara min rijiya. Carekê na belê gelek caran Narîn û xortekî ji yên ku şensê wî hebû ku pêşwaziya telefona wê bike soz û civan li ba mizgeftê yan li gulîstanê yan li ba peykerê serok didan hev, bi xewnên şeva jî hevûdu ne dîtin e, xort neh-deh caran dibere diborî û diçû û dihat û carnan jî milê wî li yê wê diket lê ew nas ne dikir, demekê baş herdû li wir dirawestiyan, dawî herdû polî poşman pişta hustên xwe dixurandin û bi dilekî xemgîn vedigeriyan malê, Narîn bahwer ne dikir bighêje mal û dest bi girî bike lew çima bextê wê wisa reşe, hêstirên wê wek ba û

baranê dihatin xwarê, çimkî xort ew nas nekir, an jî çima nehat ser soza xwe. Kî din jî di şûna xort de ba ew nas ne dikir, lê ma xort dê çawa wê nas bike û wê di telefonê de pesnê xwe wisa dabû: **-Ez dirêj û li hevhatî me, gelek xweşik û bedew im, porê min bi ser zer ve diçe û ez gewr im, lêv tenik û anî geşim, dev li ken û xwîn şêrîn im, meşa min qitikîye, rawestana min ya baze û wek mûmê şewq û nûr ji rûyê min dire.** Çawa dê bighêjin hevûdu û wê xwe di telefonê de ji Fatma Muxribî xweşik û bedewtir kiribû û hêvî û daxwaza wê ku bi lez mêrekî di ber xwe de li ser nivîna xewê bibîne, mêr qelyan nebedîbûn, gura xwarin, ma hema bext reşî bi ser serê min pepûkêde rijya. Lê Şerîn jî hîn mêr nekiriye li gel ku zanko jî kuta kiriye û gelekên weke wê di mala bavê xwe de mane, hingî bi tir û paye û poz bilindin.

Narîn gelek caran hêvî dikir ku berî dused-sêsed salî bihata dunyê, wê demê keç çawaba di mala bavê xwe de nedima, ku keçek xweyî din didan mêr roja guhestina wê ya bê mêr mayî bi berbûwan re bi rê dikirin û wisa keçên xwe yên bê mêr mayî didan mêr. Gelek caran bêhnek kûr dikşand û bi kufînî berdida û serê xwe dixist defa sênga xwe de û dipojinî pêre di nava xwe de digot:
**-Seh kurê sehan bû yê ku fermana mêrkirinê xist destê mêran de**.
Gelek xewnên wê yên gulgulî hebûn, zarokên wê çê dibûn û bi germayî hemêz dikirin, bi wan şa dibe û bi şev û roj bi wan re dilîze û bê jimar wan diramîsîne, naka û paşî ku hemû xewnên wê vemirtin roj bi roj xeradibe û bi bûkên lastîkîre dilîze û şa dibe, çîrok û serpêhatiyan ji wan re dibêje û bi wan re diaxive, tebatî qet lê tuneye û hergav mêrkirin di bîr û bala wê deye, da ji bo mêrekî da ser gelek rêyan, lê hemû li pêş wê li nîvê rê dihatin girtin û asê dibûn, ne falek ma û ne devgirêdanek ma û ne jî şêx û meleyek ma ku nivişt û morîkên si'ûdê ji ber destê wan bi xwe venekir, lê di dawya dawîde tuştek bi ser tuştekî nedixist, nizanim çawa ramana kovarê hatibû bîra wê ko nûçeyekê têde binivîse û belav bike da hêvya mana xwe pêk bîne û têde hatibû nîvîsandin:
**-Ez li mêrekî digerim, ez ne korim ne seqetim ne jî bawîme, ne payeme wek gelekan, tanî kîbe ezê wî bikim bê şert û merc, ne wek hinekan dibêjin divê textor be, divê endezyar be divê perelî -merlî be divê xweşik û meşik be**.
Bi rastî gelek pêşkêşî wê bûn lê yek tenê jî bi wê razî nebû li gel ko wê guman dikir ko çawa be dê yek ji wan bikeve qefesê û bibe mêrê çav li rê.

Ji ber hinin guneh û şaşitiyên wê ev dek û dolab hatibûn serê wê, di ciwaniya xwe de li gel ko hîn jî ciwan e lê dema ko ji xwe razî û di çav xwe de bû çendekan ew xwestin lê ew bi wan razî nebibû, wê digot çima ev girafêtê danayne, çima ev bêvil mezine, çima ev ne textor û ne mihendise, çima ne perelî û bi mal û mewdane. Niha tepa li serê xwe dixe û gelekî poşman bûye lê nema xêr dike, merov dikare bibêje ko destê xwe ji dunyê şuştiye, di van çend rojên dawî de çavên xwe li yekî bi jin û zarok digerîne ko hema pê bisitire û nêta xwe li yekî wisa xerakiriye li gel ko evya mêrê du jinaye û nan di mala wî de nîne, ango tu dikarî bibêje destê xwe ji bo mêrekî di pelîne, li gel ku kesî bawer nedikir ko wisa bi serê wê bê ji ber Narîn ji welat parêzya xwe hez dikir û gelek ramanên wê yên hêja û bedew di warê xebata siyasîde hebûn û gelek kesên ko bi sala di partiyande mabûn ev raman bi sêngek fireh dipejirandin û bi xurtî şerê dujminê nezan û paşketî dikir, gelek salan di partiyekê de jî mabû lê mexabin û ji ber ko mirovekî kurd ew nebir û ji xwe re nekir jin, hêvyên wê yên avis beravêtin, di van çend rojên dawîde şivanekî Ereb mîna tol tajîkî revand û bû çîrokek li ser her zimanî, bavê wê jî ferman da û got:
**-ê wê bikuje ezê jina xwe lê mehr bikim**.

Qamişlo
01/01/1993

# Partiya Don Kîşotan

-Çima tu bahwer nakî bi serê şêx û  tirba şêx Cibir partî wek ya me nînin..?
çi cara ko Şêro bihata ba min berî silavê li min bike wisan digot, bi rastî jî min bi wî partiya serxwebûna kurdistan naskir û hingî partiya xwe bi min şêrîn kir min di nava xwe de digot "gelo rojek heye ez bibim endamek di vê partiyê de", hêviya min ne tenê ev bû belê bi gelekî ji wisan mezintir bû, xweziya min bû ez rojekê bibim serokê vê partiyê û bila tayê kirasê min tunebe!!!

Partiya serxwebûna kurdistan bûbû mîna çiyayekî di serê min de û serê min pê giran bûbû, ji vê partiyê pê ve min nema dikarîbû ez di tuştekî dî de biramim, ji ber ev partî bûbû mîna afesanekê di hiş û ramanên min de, ne dûr e mirovekî din ba dîn biba û bi çolan biketa lê yê min tuştek bi min nehat ji ber ko Şêro dema pesnê vê partiyê di da te digot qey sibe dê kurdistan rêzgar bibe, dema ji xwe razî û devliken digot:
-rêzgar kirina kurdistanê li ser destên me ye..

Dibû sibe, lê kurdistan rêzgar nedibû, lê li gel vê yekê jî dema wî wisan digot min di nava xwe de dilîland û madê min geş dibû, min di nava xwe de digot « kurdistan li  ber derî ye », ji kêfan re qûna min nema cî digirt û devliken careke dî min di nava xwe de got « başe hîn ez sax im wê kurdistan rêzgar bibe û ev kul bi min re naçe gorê » .

Du roj ne diborîn Şêro dihat ba min û dikir giftûgoya partiya xwe, te digot qey feylesûfeke, ez jî bûbûm mîna latekî tenê min li dervê wî dimeyzand, wî wisan dikir helbet ji bo min bixe partiya xwe de, nema dev ji min berdida û min jî bi kêfxweşî pêşwaziya wî di mala xwe de dikir, ji ber ko bahweriyek li gel min peyda bûbû ko « Ev e yê kurdistanê  rêzgar bike, da çawa ezê wî  di mala xwe de ne kêfxweş û devliken pêşwaz bikim, ma çê dibe ez wî derbasî mala xwe nekim û welatekî dê ji min re ava bike, ma kê bawer dikir kurdistan çê bibe-weleh yê kurdistan çê bike gerek me re wî bi şîr û şekir xwedî bike, ko şîrê şêr di i'yarê şêr de bixwaze gerek me re jê re bîne, gerek me re wî bixe çavên xwe»  .

Carekê û piştî me şerm û fedî avêt, min jê pirsî :
-tu dibêjî rêzgarkirina kurdistanê li ser destê me ye, da felsefeya we ji bo vê yekê çî ye ?
Li qûn rînişt, cihê xwe xweşkir, wek mirovekî ji xwe razî got :
-felsefeya me taybet bi me ye, me felsefeyek ji bo xwe afirandiye, ji bo kurdîtiya xwe, li gor ahenga kesê kurd, em ne rojhilatî ne ne rojavayî ne ne jî hevalê rebê jorî ne!!!…

Dema wisan got hîn bêhtir bahweriya min bi  partiya wî hat û ew jî di çavên min de mezintirbû, dudilî min pirsek dî jê kir wek ezê zanibim wê bersiva wî çi be :
-ez endamekî dî ji te pê ve ji endamên partiya we nasnakim ?
-belê, ji ber ko partiya me gelekî penhanî ye di kar û xebata xwe ya konevanî de û dan û stendina bi kesên vê kolanê re ji min tê te xwestin.

Dema wisan got tevzînok bi laşê min ve hilkişiyan, pê re dilê min lerizî, xweşiyekê girt ser laşê min « aaaaaaax ax xwezî niha diber vê partiyê de ez şehîd bibûma, helbet ezê bihuştî bama », bê hişê xwe min wisan got û careke dî ez bi gotina wî şa bûm, ew û partiya xwe hîn bêhtir mezin bûn, ta ko îca min bêhtir ji partiyê hez kir û kar û xebat di berde kir û bahweriyeke min î bê hempa pê hat ta ko carinan min ji xwe re digot « ne dûr e ev partî cîhanê tevî rêzgar bike » !!

.
Roj bi roj min xwe bêhtir nêzîkî vê partiyê didît, min digot qey ez bê wê nema dikarim bijîm, ta ko carekê min di xew de dît ko ez bi partiyê ve zeliqîme ya ko mîna qurmê darekê qalind û bilind û xurt bû û bi kelbetan û duha û esîtê em ji hevûdu nedibûn, bi xurtî ev partî nuqutîbû dilê min, dibe ko ji ber partîyên dî tuştek nekirine û dilê mere li jiyanê sar dikin û welatparêzî li ber çavên me re reş kirine, ev bû şêst-heftê salên wan hene ji derew û xapan pêve li hevûdu û milet nekirine, hin in ji wan dibêjin Mirîşk ji hêkê ye, hinin jî dibêjin na hêk ji mirîşkê ye, yek ji wan ji ya dîre dibêje « serokê partîya me ji serokê partîya we bêhtir şîk û lihevhatiye, ta ko carekê serokê partiya me di kolanekê re derbasbû qîzikên wê kolanê hemû ne bi dilekî belê bi yazdeh dilan dil ketênê », carekê û li pêş çavên min du endaman ji van partiyan bi kulm û kêran rabûbûn hevûdu û xwîn bi ser serê hevûdu xistin çimkî yekî ji yê din re gotibû « pozê serokê we wek teriya rovî dirêj û lihevbadayî ye lê ya serokê me maşele-maşele wek ya mîr û paşa ye ».berî du rojan endamekî ji Partiya Şoreşgerên kurdistan kirin zindanê çimkî goştê ker û sehan difrot, da çawa  bahweriya merev dê bi wan were ew yên ko kar û xebata wan lîstika pelik û dadûbûna qûna qîzikan û giftûgoya li ser namûsa xelkê ye, diya min ya ko tuştekî ji konevaniyê fam nake carekê got « ev partî wek me jinanin ziman dirêj in lê tuştek ji wan nayê », carekê jî mirovekî dîn tuştek ji min re got « ev partî baş bana ezê ne dîn bama », dema yê dîn wisan got ez ji darekê ketim û min li sedema dînbûna wî pirsî, gelek kesan ji min re gotin ev yê tu pirsa wî dikî navê wî Osman e, bîst û du salan di partiyan de kar û xebat kiriye, ji partiyekê diçû partiyekê hingî ew diqewitandin, li gel ko dil rast û jîr bû jî, kar û xebat ketibû xwîna wî de, ji xwe re digot « ko ez kar û xebatê nekim tucarî welatê me rêzgar nabe » û di yek partiyê de jî ne gihaşt komîta navendî, da çawa merov bahweriyê bi partiyên wisan bîne.

Di kongirê partiyekê de ya ko nayê bahwerkirin çêbibû, di destpêka kongir de Serokê giştî pirograma salane şilfî tazî xwend, endaman jî bi fermana ko wî dabû xwe şilfî tazî kiribûn li gel çend jin jî amade bûn, dema mirovekî li sedema vê yekê ji serokê giştî pirsî, wî got :
-ji bo ko em tev weke hevûdu bin, çênabe di partiya me de endamek bi bedil û girafêt be û yek bi cilên qetyayî û pînekirî be..

Partiya serxwebûna kurdistan bûbû mîna afesanekê di ser û çavên min de, hergav bi min re dijî û bi xewnên kabûsî re dihat xewnên min, min kî didît wek dînekî min jê dipirsî :
-tu Partiya serxwebûna kurdistan nas dikî.. ?
lê wek ez ji dîwarekî bipirsim, kolan bi kolan, tax bi tax mîna dînekî min pirsa Partiya serxwebûna kurdistan dikir lê kesekî dilê min xweş û şa nekir, gotina Şêro min li bîra xwe tanî û min xwe pê razî dikir « partiya me gelekî penhanî ye… » di vê gavê de min di nava xwe de digot « kî dizane dibe ev yên ez ji wan dipirsim hemû endam bin di partiyê de », gelek caran min ji firoşgehan dipirsî :
-Partiya serxwebûna kurdistan heye.. ?
Her car min pişta hustûyê xwe polî poşman dixurand û min berê xwe dida devereke dî, ev firoşgevan ji kû partî martiyan nas dikin, ji wan weyê rengek ji lûfikê laşa ye yan jî rengek ji bîna bin çenga ye û li ba wan tune, kî dizane, dibe bi vî navî nebihîstibin jî û dibe ev tev rêxistîbin di vê partiyê de belê xwe eşkere nakin, min ji xwaringehekê pirsî:
-Partiya serxwebûna Kurdistan heye..?
Ez dizanim wî tinazên xwe bi min kir dema li min vegerand û got:
-weleh piçek hebû zibûnan xwar..

Min xwe nedît ko ez li ber dergehê dermandanekê me, min ji dermandan pirsî:
-Partiya serxwebûna kurdistan heye..?
Keniya..têr Keniya ta ko zikê wî êşiya, bi tinaz got:
-şensê te tune berî niha xilasbû..

min careke dî jê pirsî:
-ma partî xilas dibin..?
careke dî bi ken û tinaz got :
-li Esfûriyê heye bi lez xwe bighîne esfûriyê berî li wir jî xilas bibin..
Ji dema berê de pêşiyan gotin e" bi pirsê merov dighê xursê " mirovek di bin siya dareke hişk de rûniştibû û kûr û dûr diramiya, min jê pirsî :
-tu Partiya serxwebûna kurdistan nas dikî.. ?
serê xwe rakir dibin çavan re li min meyzand, tirsek bê sînor di çavên wî de hebû, ji min re got :
-belê… bi destê xwe yê çepê mirovek nîşanî min da, bi lez ber bi wî mirovî de çûm, min bilez jê pirsî :
-tu Partiya serxwebûna kurdistan nas dikî.. ?
wî jî ez dam destê yekî dî, pênc şeş caran bi min wisa kirin ta ko berê min dan yê dawî, hêdî-hêdî û bi tirs ez ber bi wî ve çûm, ziq min lê meyzand, bê hişû matmayî min got :
-tuyî.. !!
li min meyzand û keniya û keniya ta ko kefê di dev û bêvilan re avêt, kenekî dînitî û bê wate, bi ken got :
-Belê..ev jî hemû endamên partiya me ne û ez serokê wam e.
Min pirsî :
-te digot rêzgarkirina kurdistanê li ser destê me ye.. ?
Careke dî bû tiq-tiqa wî û nema rawestiya, ji nişkan de kûr li min meyzand, gavekê bê ken rawestiya, ji nişkan de careke dî bû tiq-tiqa wî û bi min keniya, paşî têr keniya ji min re got :
-Partiya çi û martiya çi hey kero ceh li bero!!, min tinazên xwe bi te dikir, diyar e tu hovî ji ber te ji min bahwer kir..
Ji nişkan de û bi hemû hêza xwe fîkand ew qas dîn li me civandin û li dor me bûn xelek, hêdî-hêdî ber bi min de nêzîk bû û bi destê min yê rastê girt û bilind kir, pê re got :
-Gelî feylesûfan..gelî endamên partiya serxwebûna kurdistan..ji îro û pêde ev Serokê we ye..
bê hişê xwe ez çeng bûm û min lîland..ji kêfan re min dîlanek dînitî kir û bi stranî jî got :
-Dawî ez bûm serokê Partiya serxwebûna kurdistan.. !!

Qamişlo-11/02/1994

## Zarav mêran dikujin

-ez ji bo axaftin û zimanê te yê şêrîn dijîm..
-wax..wax, naxwe tu ji min hez nakî?..
-ma çawa ji te hez nakim keçê, te serê min xwarê, mane ji bo te li ser vê xaka zuwa dijîm, yana niha ez ji zû ve terqiyabama.

Comerdê evîndar dixwest ji dilbera xwe Şehnaz re diyar bike ko rola zimanan di dildariyê de heye, her wisa di axaftin û têgihiştinê de jî heye. Wan bi dizî hevûdu li ser çemê Ceqceq, li bind ara tuwê li taxa Alaya ya ko dikeve rojhilatî Qamişlo dîtibûn., jixwe wê rojê hevûdu bi ramûsanan şewitandin, rû li hevûdu sor kirin. Zarokin ereban li wir şivantî dikirin, yekî ji wan jêre gotibû; jina te gelekî xweşike, yekî din gotibû; ma ne avise?. Her duwan li hevûdu nerîn û keniyabûn wek ko ji hev re bêjin xwezî em jin û mêr biwana. Şehnazê serê xwe danîbû ser sînga wî û lê guhdarî dikir. Comerd jî wek zimanzanekî daxêvî û jêre digot ko di dema berê de merov bi çav û destan bi hevûdu re daxêvîn, evîndar jî bi çav û destan bi hevûdu re daxêvîn û ji axaftinê bêtir ji hev têdighajtin, wek çilo niha ez û tu bi çavan bi hev re daxêvin. Wî jî nizanîbû çilo û li ku ziman cara yekem peyda bûn, wî ji dilbera xwe re diyar kir ko merov ji pênc melyon sal de dijîn lê kesek dîroka zimanan nizane. Şehnaz jê fam nekir çima ew vê mijarê didomîne û dubare dike, dibe ko berî niha di derbarê vê mijarê de bi dilbera xwe re neaxivîbe, yan jî dibe ko pirtûkek di derbarê zimanan de xwendibe, îca ji dilbera xwe re şirove dike. Jixwe hingî axivî serê wê êşya û ji bo ko mijara li ser zimanan birawestîne gotina wî birî û pirs kir û got:
-tu dikarî pêkenokekê bêjî ji vê axaftina zuwa bi sûdtire?.

Ew di mebesta wê de gihaşt, dixwest jêre bêje ko hun jin ne dixwînin û ne jî sebr û arama we heye ko hun li merovan guhdarî bikin, lê wî jêre ne got, tirsiya ko bitengire û nema ramûsanan bidê. Jixwe Comerd pêkenokan zane, bûyîna wî pêkenokeke, ew bixwe pêkenokeke, ew pêkenokan diafirîne û çî wî ji pêkenokan pêve heye. Dibêjin carekê sê kurd, yek ji Ingilistanê, yek ji Ferensayê û yê din ji Elmanyayê çûn Yonanistanê ba dostekî, dostê wan bi ziman nizanîbû û ji bo ko hezkirina xwe ji wan re diyar bike ew vexwendî ser goştê berxan li xwaringehê kirin, ê ji Ingilistanê got zimanê Ingilîzî li her derê mîna zimanê fermîye ezê goştê berxan ji xwe û we re bixwazim, lê gerson tiştek jê fam nekir, ê ji Ferensayê rabû û got ko zimanê Ferensawî zimanê duyemîne li dunyayê gerek gerson ji min fam bike, lê ji wî jî fam nekir, her wisa ê ji Elmanya bi poz bilindî rabû û ji gerson goştê berxan xwest, lê ji wî jî tiştek fam nekir, dostê wan ê bi zimanan nizane rabû ji wan re got ko zimanên we hemû bê sûde ne, de îca li min temaşe bikin û bû meee-meee û mirçi-mirça devê wî, ê gerson yekser çû goştê berxan ji wan re anî.
-ha ha ha….. ko tu ji min hez dikî tê pêkenokeke din bêjî.
-ma mazad e, evîna xwe ne de ber bazaran. Dibêjin li Elmanyayê serê merovekî sehek heye, yê hinan dido ne, yekî kurd jî bi tiştekî xwe ne wek merovan bû, rabû berxekî piçûk anî û di malê de xwedî kir, hin pê xortaniya xwe ya li welat dema li gund dijî li bîra xwe anî û hin jî sebra xwe pê dianî. Carekê baran ji erd û asman dibariya, dike ko bi postê ji Essen here Bochum, berxê xwe jî bi xwe re dibe, yê ajovan nahêle berx bixe postê û wan vedigerîne ber baranê, ew jî li ber deryê postê diraweste bi hêviya ko dilê ajovan bi berx bişewite û wan derbaske, dît ko jinek hat û zire sehek wek keftarekî pêre û borî postê, mêrek hat û du seh pêre û borî postê, kî hat û sehek jixwe ê hinan du seh bi wan re û ketin postê û ajovan qet napirse hun ê bi ku de biçin, ê kurd jî hingî tengirî hat ba ajovan û bi hêrs jêre got:

- warum ew ew ja me me nein ( bi Elmanî; çima seh erê û berx na). Bû tiq tiqa Şehnaz ta ko reş û şîn bû.
-kuro wele..bile..tile..bi semawele ji te hez dikim.
-nan û avên min ji vî welatî hilatin.
Dema Comerd wisa ji nişkê ve got pêre-pêre Şehnaz reş û şîn bû û di cê xwe de sar ma, ji guhê xwe bawer nekir.
-te çi got?
-min got ji bo ko hezkirina min ji te re zendî bimîne ezê ji vî welatî barkim.
Welatê ko evîn têde qedexe be jiyan lê nabe, ko bira keda bira bixwe jiyan bê wate dibe. Di bûyereke tirafîkî de dê û bavên wî berî heft salan jiyana xwe ji dest dabûn, birayê wî xuşka çarde salî dabû mêr û di mala ji sê odeyan û hewşeke fireh de asê bûbû, ji Comerd re gotibû; tu dikarî li ber sîka dîwaran bi cih bibî, ew ji mafê te yî an jî tu dikarî çadirekê di hewşê de vegrî û têde bi cih bibî, ko tu kêm dibînî bila jora malê ta bi asman ji te re bî. Ma Comerd dê çi ji jora xaniyê axînî ta bi asmanan bike. Cînarekî wî jî wisa bi jin û du zarokên xwe kiribû, roja jina diduwan anî bera jin û du kurên xwe ji malê da û telaqê wê bi tifekê û sê zixuran xistibû dest. Comerdê ko li ba terziyekî bi nan û zikê kar dikir, gelek merovan bi serê wî sûnd dixwarin, hin ji ber xwîn û zimanê wî yê xweş û şêrîn, û hin ji ber têkiliya wî ya xweş û vekirî. Comerd merovekî rast bû, qet derew nedkir, her wisa dilxweşkirina bi derewî li ba tune bû, lê bi şêweyekî digot dihişt merov jê hez bike. Li gel di çadirê de dijî mêvanên wî ji siyasetmedar û nivîskaran tim hebûn, di şazde saliya xwe de fêrî nivîsandin û xwendina bi kurdî bû bû û car caran berî ko çîrokan binivîse helbest dinivîsandin, di dawiya şevan de û piştî vexwarina meyê helbestxwendin pê xweş dibû, li mejî û sawêran dixist, her wisa sawêr şiyar dikir, îca heval û dostên wî jê hêvî dikirin ko hin helbestan bixwîne, wî yekser helbesta pêşî xwend;
Li ber lempeya lerizî.
pûtekî sernixûz im.
Ji te re tiliyên xwe dikolim
Dikim kortik, dikim paşîv û li ber te datînim,
de jiyana min bixwe.
Ez afesaneya te ya dawî me..
diranan dihûnim..dirêsim..dirizînim..,
xewna vekirî û ne mîna kavilê ji laşan
Di xewnan de şûr simbêlên min nabirin.
Mêrantî ew e ko tu bi sênga dilbera xwe şa bibî.
Lêvên xwe di bin guhan de biçînî,
Bila tu mûm bî, bila ez wek perwaneya dîn bişewitim.
Her kes wek xwe dike û wek xwe dijî û wek xwe dişke
Lê ez wek jîn û xewna hişk dişkim
Ez evîndarekî dawerivî me. Ez baran im.
givaleyên mişext bê sûde dijmêrim.
Ez stêrk im di işqa banê dilbera rih şêrîn de.
Ji bo te bûm berxê qurbanê lê te kêra ko da ser jiyana min û te oxira dawî bê xatirxwestin kir.
Yazdeh salan te ez dagîr kirim
Ma nebese, te ez kirim devê şûşe.
Wek libên tizbiyê te sal bera ser salan dan
Û tovê min hişk û zuwa kir.
Ezê çi ji bênderên ramûsanan bikim
li gel ko kêferata diljêkirinê dikim
ez kirim qirşek û qurifandim, lê
Hîn jê hez dikim

Hîn bi dû siha xwe dikevim

Ji hemû partiyan dibûn mêvanê wî û li dîtin û bîr û boçûnên wî guhdarî dikirin, her kesî jê hez dikir, ew jî endamê partiyekê bû, lê xwe wek endamekî di hemû partiyan de didît, wî tim diyar dikir ko em hemû bi hev in û em hemû ji bo yek dozê dijîn û kurdayetî ne li ba kesekî û diduwa ne, belê li ba me hemiya ne. Carekê endamê partiyekê jê xwestibû ko partiyekê bixwe çê bike dako bibe serokê wê û biryar li ba wî be û ew jî dê dev ji partiya xwe berde û bibe endamê wê, wî gotibû partiya wî heye û mezntirîn partiye, mebesta wî hemû partî yên wî ne. Comerdê ko her kesî jê hez dikir biryara qedera xwe daye lê hîna Şehnaz nizane, qedera ko ne li ser vê xakê bimre, xaka ko her kes ji bilî birayê wî jê hez bike, û tumayî merovan bixwe, merov merovan bi gotinan dixwin. Her kes ji min hez dike ji ber ko min rexne li wan nekirye, li kar û xebata wan ya di ber kurdayetiyê de nekirye, her kes dibêje ez û ne kesî din, ji ber vê jî pêşeroja me nediyar e. Ko ne ji van zimanên ko ez bi wan dizanim biwa dibe ko ji bilî endamên partiya min kesî silava xwedê jî li min nekirbiwa, her yekê bê ba min pelek di destan deye û piştî dilxweşkirinê dibêje; tu dikarî vê daxuyaniyê wergerînî kurdî, Rûsî, Ingilîzî, Firensawî.
Comerdê ko çarşema bê soza wî li bin dara Tuwê, li ber çemê Ceqceq bi dilbera wî Şehnaz re ye, dê nere ser soza xwe, Şehnaz jî dê çi ji xwe bike, hîna ne diyar e. Ewê nameyekê li başûrî darê bi yazde gavan û di şûşeyekî de, di bin axê de bihêle û beta weta bibe. Dema Şehnaz bê û wî nebîne, dê bibe kutkuta nava wê, dê yekser bi dîtina wî bê hêvî bibe, ji ber tim ew berî wê li wir bû, dê zû bi zû neyê bîra wê ko nameyek jêre hiştiye, piştî hêl têde nemîne dê di bin darê de rûnê û wî bîne ber çavên xwe, gotin û pêkenokên wî dê li bîra xwe bîne, hinekî dê bibeşişe lê zû dîsa madê wê tê guhertin, dema name bê bîra wê dê yazde gavan bi yek e û bê hişê xwe bixwîne;
*Ko rojekê ji rojan zendî vegerim, ji bo te vedigerim, ko vegerim jî dê di bîst û pêncê meha yazdan debe, bi xatirê te.*
*Ji te hez dikim*
*Comerd*
*05/03/2006*
Piştî du sal û neh mehan Şehnaza dil şikestî dê ji cînarê xwe Remo nûçeyên dildarê xwe guhdarî bike, ew niha li başûrê Kurdistanê li Silêmaniyê nûnerîtiya partiya xwe dike, tu dikarî bêje wek balyozekî ji rojava re li wir kar dike, her wisa navenda Şehnaz boyî wergerandina zimana birêve dibe, hin caran jî ji serokê Kurdistanê re wergerandina Firansawî dike. Bêhna Şehnaz vedibe, madê wê geş dibe, wê rojê bi kêf û xweşî serê xwe dideyne û radizê. Lê nizanîbû ko piştî çend rojan dê bernameya stranan ji nişkave rawste û nûçeyeke bi lez ragihîne;
*Îro katjimêr çarê pişt nîvro li ser dema kurdistanê wergerê serokê Kurdistanê Comerdê Xelo di geliyê Elî beg de fetisî, emê di nûçeyên katjimêr şeş de bi ber firehî agahdariyan bidin.*
Piştî lêkolînan diyar dibe ko dema Comerd dikeve avê çend malbatên Soranî bi seyranî li wir bûn, dema dike bifetise hawarî wan dike û alîkariyê dixwaze, lê ji ber ko ji wî têdnaghêjin kesek pêve naçe ta ko bin av dibe.
Şehnaz jî li Qamişlo qîr pêdikeve, bi çolan dikeve, porê xwe dikşîne û bang dike; hefteya bê semawenda min û Comerd e, hatin û amadebûna we şahya dilê meye.

11/07/06

**Pirtûkfiroş**

Berî du salan min ew li mehrecana Amedê dît, vê carê pirtûkên ji bo firotinê di bin çengê wî de tunebûn. Berê dema li welêt bûm, çi cara ji Şamê bihata Qamişlo riya xwe bi min jî dixist û pirtûkên sûkû sûkû li ber min radixist, ji nav wan kovarek radikir û digot;
-hîna wisa kovar di nav kurdan de derneketiye.
-çima wek wê derneketiye?, min pirsî
-ji ber ko rengînîye, wî got,

Dema min piştî yazdeh salan ew li Amedê dît, bi qasî serê derziyê nehatibû guhertin, hîna ew cil lê bûn, ew têkilî, ew bîr û bawerî, ew dîtin û bîr û boçûnên, hîna diranekî wî beş û zêrkirîbû, min di nava xwe de got; yahoo ev kevir e ev çi ye.

Li dawiya mehrecanê û berî ko her yek ji me bi riya xwe de here, û wek noka tu li kevir bixî ji hev belawela bibin, min ew vexwendî vexwarina fincaneke qehwe li çayxana Hotelmerkezî kir.

Ji bo ko gelekî dirêj nekim, di ber vexwarina qehwe û dew re, ev gift û goya li jêr di nav me de çêbû.
-kuro Silîvo tu hîna wek berêyî, tu qet nehatiyî guhertin?,
-ma ez gumgumok im her ji du rojan bi rûyekî bim, du rû besin.
-tu ji berê de bikêrî xwe tê.
-ne wisa be ez û zarokên xwe emê ji birçîna bimrin û kes nanekî nade me.
-ev raste, lê ne ta vê redeye jî lo.
-ko ez ne wisa biwama, kê dê ez vexwendî vê mehrecanê kiribama.
-mexabin wisa bûye.
-çima mexabin, ko tu ne wisa bî, weleh û bileh û tileh kes silava xwedê li te nake.
-mexabin wisa bûye.
-divê tu hinekî şelaf bî, hinekî xwe şayîk bikî, yana tu nabî tiştek.
-lê gelek nivîskarên xurt û bilind piştguh dibin.
-ew ji dîrokê re dinivîsin
-û tu ji kêre dinivîsî?
-ji zik û zarokên xwe re.
-min ji rastiya te hez kir.
-ko ne wisa biwama nediçûm Kurdistana azad.
-ez agahdarim ko tu her ji demekê diçî wir.
-raste, piştî nivîsandina bîst û du gotaran dirim wir.
-ma tu geşta xwe li wir werdigrî.
-ew ne geşte, belê piştgirî û sûde ji hev wergirtine.
-ez di vê de negihaştim.
-rovî û sûk.
-dîsa têde negihaştim.
-soranî û latînî!
-cardî têde negihaştim.
-bi cehnima te kirî tu têde negihaşt
-bibore divê herim destavê.

26/10/2006

**Li min şeşûkê**

Demjimêr yazdehê sibeha şemiyê bû, min û xanima xwe diber dengê Şeyda re qehweya sibehê vedixwar, geh em dikeniyan û geh jî ji nişkande min êrîş dibir rû û lêvên wê û geh ew bi germî maç dikir û geh jî gez dikir, di wê kêlîkê de min guman dikir ko em tenê li dunyaya mezin dijîn. Me her tişt germ û xweş û şêrîn kiribû. Ji nişkande telefona malê lêda, min hîna ya destan venekirbû, berî bersivê bidim, min ji xanima xwe re got:
-kêfxweşî tim diqurmiçe, xwedê xêr bike..
-Simko, rojbaş
-ez Welîdê Efrînî me, tu çawayî Simko?
-spas Welîd, tu çawayî?, xweda xêr bike vê sibehê,
-xwe amade bike ji niha û çarîkekê li ba te me.
-xêre yaho?, te nava min qetand.
-xwe amade bike emê biçin balafirxaneya Frankfort.
-wê diya te, xesûya te, wê kî bê?
-ne ev û ne ew, xwe amade bike ez hatim.
Di rê de Welîd ji min re got, ko destgirtiya hevalekî wî ji welêt tê, hal, mal, dost, heval û merovên wî ez im, û ne xweşike ko tenê li balafirxaneyê pêşwaziya wê bike, min jî wek piştgirî jêre diyar kir ko cara pêşîye û raste nexweşike.
Li balafirxaneya Frankfort Welîd ez û dostê xwe bi hevûdu dan nasîn. Xwezya min di ber min de ma, çogên min sist bûn û kirî ji qam de biketama, min xwest tiştekî di guhê Welîd de bêjim lê dostê wî baqek gulên sor da dest û ew mijûl kir, her wisa kamîra jî da dest min û bi ken got:
-tu xweşik bikşînî ha.
Min serê xwe bi wateya erê hejand û berê kamîra xist deriyê ko dê destgirtiya wî jê diyar bibe, dema ji derî derket yekser berê xwe da Welîd û destê silavê jêre dirêj kir, Welîd ji şerma sor û şîn bû, xweziya wî diber de ma û bihecandin got:
-n e.. e z i m.. e w e..
Dema li destgirtiyê xwe nêrî qîrek bi şewat veda, û ji qam de hat xwarê:
-yadêêêêêêêêêêêê rebenê, li min pepûkê, li min şeşûkê, li min qirikê, li min bextreşê…min vegerînin, ez nema mêran dikim, ez poşman bûm, hawarê..hawarê.

Ji şerma min kamîra danî û bi dizî fiskiland, jixwe ewqse merovên li wir bi çav in matmayî lê dinêrîn û polis yekser hatin û lêkolîn kirin. Di eynî rojê de jî keçik vegerandin welatê wê, û em jî bi xemgînî vegeriyan mala xwe.

Dema xanima min ez bê mad dîtim, pirs kir û got:
-xêre Simko, çima tu xemgînî?
Ji bo ko wê jî xemgîn nekim û kêfa wê lê neşkînim, min bersiva wê neda û nexwest jêre bêjim. Min yekser televizyon pêxist, ez li çi binerim, min ji çavên xwe bawer nekir, ko destgirtiya hevalê Welîd porê xwe dikşîne û bêhnçikyayî dike qîr û hawar, dema xanima min ez di televizyonê de dîtim, bi hêrs pirsî:
-çi heye Simko, çima tu nabêjî, ma ez ne jina te me?, weleh û bileh û tileh ko tu nebêjî tu îşev neket nav nivîna min û bi min re raneza.
Rabû min jêre ta bi derzî vekir û got: hevalê Welîd ê şêst û şeş salî, ji bo ko bizewice wêneyê xwe yê berî bîst û du salan ji keçkêre dişîne..
Xanima min gotina min birrî û got:
-bese, ez têdgihaştim, birastî hin ji dê û bavê xwe şerm nakin, ma hîna lê radibe?

-ko paçik û pîşo rabûn dê li wî jî rabe, berî bîst û du salan lê ranebû îca niha dê lê rabe, li mala bavê siwaran be..

Min devê xwe bir bin guhê xanima xwe û jêr e got:
-de me çi ji wan e lê…

14/10/2006

# Serok û merok

Yekemîn car min ew dît, yekser min jê hez kir, ev berî heft salan bû, li gundê Bexçe ko dikeve rojavayî gundê me, xelkên wan gundan hemû hatibûn, li serokê partiya me guhdarî bikin. Wê şevê pir axivî, gelekî axivî, di nava min de ramanekê cihê xwe çêkir, dema axaftina xwe bi dawî anî kesek li dijî wî derneket û rexne lê negirt, hemiyan serê xwe jêre dihejandin û di tewandin li gel ko hemû ne ji partiya me bûn.
Min ji gelek axaftina wî fam nedikir, hişê min ne li wir bû ta min çareser kir û di dawiya şevbêrkê de min serok xewle kir û jêre got û pirsî:
-ma tu bi jinî?
-belê
Dema got belê wek tu distek ava sar bi ser min dakî ez bê hêvî bûm, ji vê riyê pêve min nedîtibû ko ez wî bikim merovê xwe.
Li dawiya wê şevê û piştî wê axaftina bi bandor wek hemiyan me ew kir wek pêxemberekî û li ser serê xwe danî, hemiyan dev ji partiyên xwe berdan û di cê cî de kaxeza endametiya xwe ji partiya me re nivîsandin û imza xwe li bin dan. Piştî semîner bi dawî hat wey li wî yê ko bi vexwendina wî bi serkeve, bibû şer, şer jî ji bo vexwendina serok bo mal giran bibû, hemû divên serok bibne ba xwe, hemû dizanin ko serok bibe mêvanê kê ew dê ta demek dûr û dirêj çîroka li ser zimanan bî, her yekî jî karînên xwe ji bo serok pêşkêş dikir, ê ko got îşev wê wî bibe bajêr û li xwaringeha herî xweş û buha bi nan û dan bike, yekî got ko ew ê sê mih û sê beranan li ber lingên wî serjê bikî û bû qayîş, deh min û deh beran, bîst çêlek, bîst û neh golik, sî û heft gamêş, yekî sûnda hew jê girantir xwar û got ko ew ê keriyê pez û garanê dewaran serjêke ko ew îşev bibî mêvanê wî, min di guhê wî de tiştek got lê wî ez bê hêvî kirim dema got ko du zarokên wî jî hene, min dîsa got:
-dudu jî dibin, ma tu ne misulmanî..
-na ko bibe jî wê bê hewî be.
Serok peyva min û wan birrî û got:
-hevalno xwezî min bikarîba xwe bikim sed perçe da bibim mêvanê we hemiyan.
-tu îşev mêvanê min e, çimkî xanima min mirîşka li ser hêkan serjêkiriye û got ko tu wî bi xwe re neîne neyê mal.
Dîsa serok got:
-hevalno ji bo ko em hemû bi hevûdu re bimînin ka li vir xwarinekê çê bikin..
dema serok wisa got hemû wek mirîşka dîk ji ser peyabe, sistbûn
Ev bûyer berî heft salan bû, niha her tişt hatiye guhertin, xelkên berî deh duwazdeh salan dibêjin ko carekê dê serok ji bo semînerekê bihata gundekî ji van gundan ew gund jî bi şeş heft kîlo metran ji riya qîr kirî dûr bû da çend merovan ew li ser pişta xwe hilgirtin da ko sola wî herî negire.
Niha her tişt hatiye guhertin û tiştek wek xwe nemaye, ka serokê berê û ka ê niha, erê serok hemû dibên em serok in. Dibêjin serokên hin welatên Euripî dirin sûk û çarcihan, bi xwe pêdiviyên xwe dikirin ê me hîn nizane sûk û çarcih li ku ne, yek şekir û çayê jêre dibe yek nan dibe, yek rûn û zeyt û helawê dibe, yek jî fêkî û şînahiyê dibe, jixwe her hefte jinek ji jinên hevalan cil û tejik û kulavên wî dişo. Jina wî ya ko ji xêra xweda reviya û çû ser dilovaniya xwe, endamekî partiyê ew diyarî dabû wî, wilo bê tiştek, bê next û zêr û devê derî, roja guheztinê xalanên wê ketin rê û gotin em xelata xwe dixwazin, wê rojê kirî xwîn bimeşya, serok ji wan re got:
-qey hun nizanin ez kî me, gerek hun min xelat bikin ji ber ezê bibim zavê we..
Niha serok bûne ax û xwelî, ji dengbêjan pirtir bûne. Berî çend rojan endamekî partiya me ji gundê Qîra, bi du gundan dikeve bakurê gundê me, çûbû Qamişlo, berî bipeyive û ji min re bêje sûnd xwar û got :
-min serok dît

-na lo, bi rastî ha..!!
-xwezî min ew nedîba.. !!
-çima kuro, çi heye ?
-min serok li ber firna Mirado dît, li benda nan bû.
Bêhna min çikiya dema min ev yek guhdar kir û ez bi tepa bi serê xwe ketim, min got :
-naxwe serokê me jî bûye wek serokên din. Min wisa got di dema ko min hez ne dikir vê yekê bawer bikim, dîsa min got:
-kuro dibe ko ne ew be, ma tu wî baş nas dikî?
-Sorooo, ezê kirasê xwe biqetînim ha..
ev tê wê wateyê ko rêz ji serok re nemaye, jixwe niha hin kes belê pir kes rexnan lê digrin û bê jimar şaşî û gunehên wî dijmêrin, jixwe berî du sê rojan cînarekî serok ji bo belav kirina vê nûçeyê hatibû herêmê, bav û kalên wî ji gundê Mirîşkê ne lê xweda ew li Qamişlo da, dema me hevûdu dît yekser got:
-tu zane niha serok çi dikî?
Li gel min nedixwest bizanibim û guhdar bikim lê ez mecbûr mam û min pirsî:
-na, çi dike?
-ezbenî niha paporê pêdixe, rojane haaaaa….
-ma çi pêve heye merov alîkariya xanima xwe bike, ma tu zane serokên Ewrupî çi dikin..
-Soroooooooo, ev gotin ne ya te ye
-ê erê ma çi pê heye..
-Soro, ezê kirasê xwe biqetînim ha..
van peyvan bi xurtî bandora xwe li min dikir û ji ber ko niha îca rexne jî lê tên girtin, carnan ez poşman dibim ko min ew ev yazdeh sal wek serok pejirandiye, jixwe niha hin kes rexne dikin û dibêjin ma dibe ko ji sî û heft salan de serok be, ma kesek din tune şûna wî bigre. Dibêjin serok nema serokê berê ye, nema wek berê dizane biaxive, baş bû ko xuşka min ya bi tenê jêre nebû jin, eeeeeeeew ezê niha çi poşman bibûma.

Gotinbêj û rexne di derheqa serok de pir bûne, min jî nedixwest tiştekî guhdar bikim. Gelo divê ez çi bikim?, min ji xwe dipirsî, rewşa min xerabibû, şeş roj û şeş şevan min derî li xwe girt û ji oda xwe ya piçûk derneketim, di encamê de min ev name ji serok re nivîsand.

Serokê hêja,
« Silavin gulgulî û ev dem û hemû demên te şad û bextewer bin.
Ji ber ko her tişt hatiye guhertin û tu bi tenha wek xwe maye, tu nayê guhertin, ez vekirî ji te re dinivîsim ko tu dev ji serokatiya partiyê berde hîn ruwê te bi teniyê nehatiye şuştin, hîn hêvî heye ko em kurdistanê rêzgar bikin, çimkî serokatî nema tu nan û avê didî te. Me pir ji te hez dikir nemaze dema tu nû bû serok û çend salên bi dûde jî, lê niha her tişt hatiye guhertin.
Dema tu di hevraziya xwe de bû min ji te re nimêj dikir, niha ez nifiran li te dikim ko zû xweda rihê te bistîne da ko serokatî li şûna te bimîne, jixwe ko ne mirin be tiştek we ji hev naxîne.
Tu zanî ez ew ê ko dixwest xuşka xwe bidî te, ma ez hatim bîra te, lê niha û ji ber ko her tişt hatiye guhertin ji bilî te, ko ez wê bidim toltajiyan ez wê nadim te. Ma tê bîra te cara pêşî tu hat mala me, te dît diya min çi ji te re kir lê ko tu niha were bawerke te derbasî malê jî nake.
Tê bîra te berî sêzdeh salan tu hat gundê me, tê bîra te gundiyan çi ji te re kirin û çi nekirin, ko nayê bîra te ezê ji te re bêjim, bi dehan min, berx, beran, çêlek, deve û gamêş li pêşiya te, li ber lingên te serjêkirin, lê te dixwest goştê çûkan bixwe, wê rojê me çûk li gund nehiştin, nifşek kelandî, nifşek qelandî û nifşek birajtî me li ber te danî, tu li ku ba gepa xweş li ber te bû, qeymax li ber te bû, serî li ber te bûn, wey li wî yê ko li kêleka te rûnişta, tu serok bû û em kole bûn ji te re, wek zarokekî delalî em li te meqatebûn, me destên te ji tewaş dişuştin wek em destên zarokekî bişon, lê niha ko tu malê hind û yemenê bidî min ez destên te naşom û avê li destên te nakim.

Çavên jin û qîzên me li te bûn, ji bo te jinan dev ji mêrên xwe berdidan, jin û qîzên me li dor te digeriyan hêviya wan bû ko tu şevekê bi wan re razê, lê niha û ji ber ko her tişt hatiye guhertin lê tu bi tenê wek xwe maye, ew bi sehan re razên bi te re ranazên, ez zanim tu bi gelek jinan re razaye û te gelek jî avis kirin û te bi dehan zarokên sê çar mehî ji ber wan kir, lê niha jina te ya duyemîn nahêle tu pêre razê. nema kesek te bera ser xwe dide, qehp jî te bera ser xwe nadin.
Tê bîra te berî yazdeh salan li gundê Kurma û di semînereke mezin de, min gote te :
-tu pêxemberê me kurdaye..
lê niha nimêja bi te re betale û xweda napejirîne, vêga merov çiqasî ji te dûr be ewqasî merov gunehan nake. Ma tu zanî çima û ji bo çi kesek narî mizgefta bi mala te ve, ko tu nizanibe ji sofî Elî bipirse. Ji niha de xelk qewîtiya xwe dibêjin û dinivîsin; goristana ko tê lê bê veşartin (( xwezî îro be )) wan lê veneşêrin. Şêx û Melan cihê xwe didan te, tu tim di sênga civatê debû, me bi dû te de nimêj dikir, te çi digot me digot “ amîn”. em bi te re û tenê ji te re sernerm bûn. tu şivan bû em pez bûn, tu gavan bû em dewar bûn, te bigota bimrin em dimirin te bigota rabin em radibûn, me tenê bi ya te dikir, ne ko em ji te ditirsiyan belê me ji te hez dikir. Lê niha û ji ber ko her tişt hatiye guhertin û tu wek xwe maye em nema silava xwedê jî li te dikin.
Tu çîroka li ser zimanan bû, te bêtar û qezayên me çareser dikirin, ko ne tu ba ma kê dikarîbû ewqas şer û kujtinan vemrîne. Dema gotina te nedibû dudu gelek xort û qîzan hevûdu direvandin û xwe ditavêtin tor û bextê te. Lê niha û ji ber ko her tişt hatiye guhertin lê tu na kes nema nan ji destê te digre.
Wêneyê te li her malê daliqandîbû û tu vê baş dizane, me navê te yê nexweş li zarokên xwe dikir, niha hemû mûlidan didin da ko xwe ji te û navê te bêrî bikin, dema yekî navê xwe kir Dehşiko, gotibû:
-wek ez îro ji diya xwe re bûm..
Tê bîra te roja me tu li ser pişta xwe kir, me çar pênc mêran ji riya qîr kirî ta bi mala ko civîn lêbû hilgirt, da ko sola te ya Îtalî ya ko bavê endamekî ji Holenda ji te re diyarî anîbû, herî negre, tê bîra te dema tu li ser pişta min bû te çi got:
-ma hevalên me jin nînin?
Wê çaxê me mebesta te baş fam kir, gerek me tu li wir wek sehekî mirî bavêtate, te dixwest li xuşk û jinên me siwar bibe, ji ber ko tu wê demê serokê serokan bû me bi te re deng nekir lê niha û ji ber ko her tişt hatiye guhertin ko tu wisa bêjî perçê mezin ji laşê te dê guhê te be.
Ji bo ko gelekî li te dirêj nekim, bi kurtî û vekirî ji te re dibêjim: tu û serokayetî nema ji hevûdu re dibin » .

Soroyê Qilçixo<br>Nehroz di 11.11.2003

Wek ko diyare xelkên me dixwazin her tiştî bizanibin û ji bo ko name bighê destên wî bê ko kesek din veke min bi mûma sor girt.
Dema min derî vekir diya min bi her du destên xwe pozê xwe girtibû, pêre madê wê tirş û tal bibû, diyar bû bêhna miraran ji laşê min difûriya. Jixwe xuşka min ya bi tenê ya ko min hez dikir bighê serok, dema berê xwe da oda min ji nîvê rê vegeriya, nava wê li hev ket, dilê wê xeliya, reş û şîn bû, ma hiner hatin serê wê û piştî ko verşiya, ji verşandina wê min nas kir ko firavîna me kortik bû, piştî ko bi hişê xwe ve hat, bi bêhneke teng got :
-ko te ji bavê xwe fedî bikra te wisa dikir.
Diya min jî avêt ber û got:
-ew çi serok merokin tu xwe ji bo wî dixe wê rewşê.
Min jî avêt ber wan û ji xwe re got bê ko deng here wan:
-ma gelo ya ko min kir rast bû…de ka ezê li benda encama wê nameyê bim a ko kes newêre ji xwe re binivîse min ji serok re nivîsand, bê çi çê dibe…

ez ji we venaşêrim, piştî demekê namek giha min du tişt têde bûn: fîşekek û gotina: tifû..

25.11.2003 Holenda

# Azadî

## Azadî –1

Tenê li ber deng û mûzîka Xoşnav Têlo dîn û har dibû, devê wî nediket hev, hêrs dibû, ta ko deng û mûzîka Xoşnav Têlo lidarba çîv çîva wî bû.
Carekê û di wê rewşê de Memo, kurê min yê biçûk deriyê qefesê vekir, çûk firek da xwe û cardî vegeriya qefesê, di cara duduyan de du fir dan xwe û vegeriya, di ya din de çar fir dan xwe û vegeriya, di ya dawî de di pencera vekirî re sînorên malê û derî û penceran derbas kir, û nema diyar bû.!!!
Piştî sê rojan ji nebedîbûna wî Memo giriya û got:
-min bêriya çîve çîv û dînîtiya wî kiriye…
-Weleh min jî kurê min, ma ka ez karim çi bikim, erê ko min Xoşnav didanî pê re distira..hevalekî baş bû..
di wê rewşa bêzar û reşbînî de, çûk westayî kete malê û di qefesa xwe de bê deng ma, û ta bi zelqa xwe xwar.

## Azadî –2

Ez bi tenha xwe li mal bûm, xewn û xeyalên qîzaniyê ez kûr û dûr biribûm. Ji nişkan de çûk dîn û har bû û ez ji xweşiya xewn û xeyalan vegerandim, tebat û hedan neket canê wî. Hate bîra min ko strana **Siba te bixêr kurdistana min** ya Xoşnav Têlo jê re deynim, pêre pêre çûk rawesta weke tu derziyeke bencê lêxî û nema deng jê hat, ji qefesa xwe ya vekirî firya û çû balkonê, li ser têla cilan danî ta ko stran bi dawî bû.
-eeeeeeeeeeeeeeeeeew min çuqasî bêriya wî kiriye…

## Azadî –3

Çîv çîvekê ji der ve, çîve çîva çukê me bêhtir kir, har û dîn kir. Berî wê sar û bê dengbû. Ev demeke ko bi me re dijî, cara yekemîn e ko ez wî wisa har û dîn û bi hêrs dibînim. Carnan û dema min stranên Xoşnav Têlo didanîn, ew har û dîn dibû lê har û dînîtiyeke şêrîn bû wek ji xwe re dîlanê bike. Lê dema ew çîve çîva ko ji der ve hatê kete rewşeke xerab de.

Ji ber ko debara me nema ji ber çîve çîva wî ya bi hêrs bû, min deriyê qefesê lê vekir, bi vekirina deriyê qefesê re firî û bi hemû hêza xwe, weke korekî xwe li cama pencerê da, weke kevirekî ji jor de hate xwar, dema li erdê ket tepînî jê hat, te digot ne îro miriye ji berî yazdeh rojan de miriye.
Min di nava xwe de got:
-xwezî min bizanîba bê wî bê xwedî mayê ha çi jê re got..

Holenda, 2003

## Ji te re adet e çima ji min porkurê re qebhet e?

-keça min tu çima bê hevalî..?
dema diya wê wisa got, devê wê gazekê ji hev çû û mabûbû ziq li diya xwe binere, ev yek ji diya xwe ya ko guhê wê bi şîretan qul qulqn dibû, bawer nekir, ta do diya wê ew bi şîret dikir; binere keça min em ne Holendîne ha, em kurd in, divê em wek kurdan li vir bijîn, bi kurdî biaxivin, bi kurdî bigrîn û bikenin, li ba me kurdan nabe hevalê qîzê weke Holendiyan hebe ta roja mêrkirinê divê qîz paqij bimîne û şeref û namûsa xwe û malbatê biparêze. Çîrok û serpêhatiyên ko diya wê di şevên zivistanên dirêj de jêre digotin hatin bîra wê, di dema ko diya wê ew çîrok û serpêhatî jêre digotin, ew di mebesta diya xwe de nedighaşt, lê niha û piştî vê xwestekê têde gihaş çima û ji bo çi diya wê çîroka Reşoyê Darê û Axa û jina Xerat jêre digotin. Axa yê ko xwe mîna pêxemberekî didît, ko çavên wî bi çi jina xweşik û spehî ketana, êdî ew jin nema ji wî xilas dibû. dema Axa ew dît yekser berê mêrê wê yê xerat da riya çûn û nehatinê û çû ba wê, wê çend hêkên kelandî û rengînî li ber danîn û jêre got ; bixwe, paşî xwarina çendekan Axa hêk weke hevûdu dîtin lê tenê wê ew rengînî kiribûn. jina xerat jêre diyar kiribû ko jin hemû wisa ne, hemû jin in lê her yek bi rengekîye; êdî tu çi ji min dixwazî û ez jî weke jinên te me, ez jî jin im. Axa polî poşman vegeriya nav nivîna jina xwe ya piçûk, lê wê şevê tuştek nekir, paşî ko baş di gotina jina xerat de mijûl bûbû. Di dawiya her çîrokê de digot ; Şêrîna diya xwe divê yekê de bighêje, eger tu ne weke wê be tu ê serêşandinê ji xwe û me re çê bikî.

Ev demeke nav wan sarogermo bûye, dê nema şîretan weke berê lê dike û ev li xweşiya wê dihat, wê ji xwe re digot qey ez mezin bûme diya min êdî şerm dike şîretan li min bike dako ez xwe piçûk nebînim. Jixwe dê her tuşte, bira û bavê ko tenê şeş mehan nivîna diya wê germ kiribû û bi gihaştina diya wê re ew bû. hefteya borî dema ji nişkan de derî li diya xwe vekir wê ji çavên xwe bawer nekir, wê got û pirsî :
-dayê tu çi dikî.. ?
-ma tu nabînî ez çi dikim !!. bi bêhntengî û bê ko lê binere got.
Şerm kir li diya xwe vegerîne, hinarkên rûyê wê sor bûn û bê ko tuştekî bêje bazda oda xwe, ramanekê ew bir yekê ew anî, gelo çima diya min rûyê xwe radike, di dema dawîde xeleka mêrkirina jibîr kirî jî nema dideyne, cil û solên nû li xwe dike. Lê ez dê li ser ya xwe bimînim û ta ji min bê ez nahêlim kesek wê ji min bistînî, nabî diya min mêrekî din bikî û pêre here ser textê xewê, jixwe ev gotin a wê ye, ew dê bi kesekî din re xew neke ta ko bîna bavê min di laş û damar û nava wê de be.
-Şêrîna min tu çilo razîye ez dê wê bikim
wek zarokek piçûk û bi girî xwe avêt hemêza diya xwe, kelo girî got :
-ez naxwazim tu mêra bikî..
-min jî negotiye dilê min, çi çaxa te mêr kir tu biryarê bide ka ez mêr bikim an na, lê divê tu hevalekî Holendî ji xwe re bibînî.

Ev nozdeh sal in ku ji dil û hinavên germ cuda û dûr ketiye. Hemêza dê germ û xweştirîn welate, ev deng, tep tepa dil li guhê wê xweş tê, ji dema ko giyan xwe berda nava wê û ji dema ko yekem car lebitî ew dil pêre bû, ew dilorand û jîn dida, jixwe niha jî dil wê yekê dike lê bi şêweyekî din, ew dizane ko dora wê ye. Hevalên wê qerf û tinazan pê dikin û dibêjin; hun rojhilatî ji xweşiya jiyana xwe re kar nakin, ji hevaltiya xort û qîzan xweş û şêrîntir tuştek tune, jixwe çend sal in em ê hemû kurk bikevin û mîna pûtekî roj li pey rojê û hêvî li pey

hêviyê bijmêrin. Nêzîktirîn hevala wê ya Holendî Karîn e, berevajî diya wê rojane ew bi şîret dikir, gelek caran Karîn ji qestî li pêş çavên Şêrîn devê xwe dixist devê hevalê xwe û dibin çavan re li Şêrîn dinerî, Şêrîn jî sor û şîn dibû û bi hêrs ji Karîn re digot:
-hezar carî min ji te re gotiye li pêş min vê yekê meke.

Dudilî diramiya û hestek xerîb ew guvaşt. Diya wê ew bi şîret û şeref û namûsê mezin kir, ji xwe re digot ko ez ne kurd bama niha hevalê min jî heba û min ê jî devê xwe bixista devê wî, hest bû ko ne azade, ev jî rengek ji azadiyê ye, dê, şîret, şeref û namûs azadiyê bê giyan û qam bostî dikin, jixwe ez li ser vê yekê perwerde bûme. Dudiliî çavên xwe vekirin dît ko tenê ye û wê sare û ne di hemêza diya xwe ya germ de ye. Diya wê ya ko wê bi malê hind û yemenê nade biryarên xwe li ser wê ferz dike, geh dibêje; nabe hevalê te hebe, geh jî dibêje bila Holendî be. Şêrîn ev yek baş fam nekir, pirsî û got :
-lê ji bo çi bila Holendî be?
-roja tu dev ji wî berdî tê nas bikî çima..!, diya wê wisa bersiva wê da.
Şêrîn hez dikir hevalê wê ji civaka wê be dako ji Holendiyan re diyar bike ko ew ne kêmî wan in. Dizanîbû ko here zankoyê dê guneh û hovîtiyan bike, bang li diya xwe kir û jêre got:
-tu dikarî wek Kenger min bixî nava xwe de?
-ma tu narî zankoyê.
-baştire ko ez nerim.

Li kêleka dilê yekemîn ko jê hez kir û di hemêza diya xwe ya germ de hat bîra wê ko heft salî bû, ne tenê şaşî û guneh nedikir, belê tunebûn, hat bîra wê ko carekê Padîşahekî ji qîza xwe ya delalî û bi tenê pirsî:
-keça min î ko ez pir jê hez dikim, di dinyê de çi gelekî gelekî xweşe ?
-razana bi mêr re!!,
dema keça şazdeh salî wisa got pêre pêre madê bavê wê reş û şîn bû, tirs û tevzînok bi laşê wê ve hilperikîn, nas kir ko bavê xwe bi wê gotinê aciz kir, wî yekser birayara dalqandina wê dide, da ko xwe ji şermezariya wê bişo, di dadgehê de dadmend jê pirsî :
-te çima wisa got ? te bavê xwe şermezar kir, ma tu bi mêran re razayî?
-na ez ranezame..!!
-çimkî tu ranezayî wek tu dibêjî, êdî çilo tu wisa dibêjî?
-min ev yek ji diya xwe nas kir, dema dizê ax û ofa wê di asmanê heftan re derdikeve, lê du roj narin careke din bavê min bera ser xwe dide û dizane ko dê avis bibe û careke din bikeve wê rewşa xerab de. Rewşê xanima Reşoyê Darê hate bîra wê, ya ko di zindana(şikefta) Berdewîl de û bi cendekê Lewend Axa yê qet qeto kirî porê mêrê xwe spî kiribû, dako şeref û namûsa xwe û mêrê xwe biparêze, wê ew di mal de kirbû qet qeto û avêtibû binê zindana berdewîl a ko bi roj kesekî newêrî derbasî wê bibe, paşî laşê wî bi bivir kiribû qet qeto jêre gotibû; De bixwe şeref û namûsa keçên bava ne bê xwedî ye. Li van welatan ne ev heye ne jî ew heye, tenê hevaltiya xort û qîzan heye, ne şeref heye ne jî namûs heye, her merovek bi xwe û ji xwe re dike, bêguman wisa raste çimkî jin jî wek mêr can û giyanin, ma ez ne can û giyanim, helbet diya min ji bo min wisa dibêjî, wê diye û kiriye û ew çêtir zane û ji bo ko ez ji wê xweşiyê bêpar nemînim diya min ji min dixwaze ko hevalekî Holendî bigrim.

-Şêrîn.., wek marek pê vede bi dengê Marko Van de Meide re veciniqî dema wî bang li wê kir û ji xewn û sawêran şiyar kir, baş bû ko kes li dora wê tunebû, li ser daxwaza Şêrîn li ba rûnişt, dît ko îro Şêrîn ji her roj bêhtir ber bi wî ve diçe, ev du sal rojane hev dibînin û di yek rêzê de dixwînin. Wî bi şerm û germayî got :
-Şêrîn ez ji zûve ji te hez dikim lê min newêrîbû hezkirina xwe ji te re bibêjim û eşkere bikim..
-çima te nediwêrî ma min ê tu xwariba..?

-min guman dikir hun xelkên rojhilat hez kirinê nas nakin yan jî li ba we qedexeye. Dema wî wisa got Şêrîn xwe çeng kir hemêza wî, wî digot qey xewne, ew ber bi xwe ve kişand û dixwest ko bibin laşek, dixwest dem wisa raweste û hemû hevalên wî çi qîz çi xort wî di wê rewşê de bibînin. Hemiyan tinazên xwe bi wî wek bi Şêrîn dikirin û digotin tu bê hevalkî, wî bawer nedikir ko rojekê ji rojan Şêrîn jê hez bike û di hemêza xwe de bibîne. Di hemêza wî de hestê azadiyeke bê sînor hatê. Wek du perwaneyan firiyan û bi hev re digotin; em pêlên derya ne.
-divê tu navê xwe bikî Ferhad, Li ser riya malê ev jê xwest. Wê li malê yekser ji diya xwe re eşkere kir ko wê Ferhadê dilê xwe dît, vê yekê şahî xiste dilê diya wê, ji xwe re digot ko min bizanîba diya min huqasî dê şa û kêfxweş bibe min ê ji zûde Ferhadê xwe girtiba, diya wê got :
-dema tu bixwazî tu dikarî wî bînî mal.
-ez niha dixwzim wî bibînim.
-Ez jî..
-na ko hat jî emê herin oda min.

Di oda wê de sê wêne bi dîwar ve daliqandî bûn, Mihemed Şêxo, Celadet Bedirxan û di ser neynikê re jî wêneyê Diyana daliqandî bû, di wê odê de bi şîret û çîrok û serpêhatiyên ko diya wê jê re digotin mezin bûbû, niha di wê odê de di ber Ferhadê xwe de ye û ax û ofa wê ye. Diya wê jî ew deng dikir û di qelşa derî re li wan dinerî, bûbû pîzotek ji agir, destek xistibû nav lingên xwe û bi yê din çiçkên xwe diguvaştin, helke helk pê ketibû, di nava xwe de digot; gelo heye careke din ez tiştekî wisa bikim, dixwest ko ew û ne Şêrîn ba, dema dengê ax û ofê rawesta bêhn çikyayî diya wê bang li wê kir û got:
-çilo bû Şêrîna min, xweşbû?
-aaaaaaaaaaax dayê jiyane..gelekî xweşe, çilo ta niha min xwe jê bêpar hiştibû û bi ya te nedikir nizanim,
-ji ber ko jiyane û gelekî xweşe êdî tu çima min jê bêpar dihêlî keça min?.
- bibore dayê..qurban im bibore...

09.09.2003
Holenda

# Sipî bûne serok

Roja pêncşemê 5ê heyva avdarê cejna bûyîna jina wî bû. Min û wî hevûdu li leşkeriyê naskir, piştî leşkeriyê jî dostaniya me berdewamkir û ji ber ku em herdu li bajarekî dijîn ciwanmêr ez jî vexwendî cejna bûyîna jina xwe kirim. Gelek mêr û jin hebûn ji nav hemiyan yekî bala min kişand û çavên min mabûn li ser wî, dema nû kete derî tiliyên wî di nav porê wî de bûn, rûnişt rûnenişt dest bi peyvê kir û got:
-Paqijî navnîşana şaristaniyê ye, ku merov paqij be xelk ji merov hez dikin û merov bi hesanî dikeve dilê yê ku merov dibîne, ku tu ne paqij bî cihê te di civat û cihên wisa de nîne, belê ku merov qirêjî be, merov û Seh weke hev in, paqijî ji bahweriyê ye!!.

Yê ku tiliyên wî di nav porê wî de bûn bigir du katjimêran li ser paqijiyê peyivî, helbet wê hîn jî bipeyivya lê ya ku cejna bûyîna wê bû bi mebestî pêkenokek got da ku wî birawestîne, ya ku cejna bûyîna wê bû ji kuf kufa bi me ketibû nas kir ku em nema dikarin lê guhdar bikin yan jî em ê hemû rabin herin malên xwe û yan jî dê şahiya cejna bûyîna wê bibe şîn û girî. Mêrê ya ku cejna bûyîna wê bû ango dostê min tebatî nediket canê wî, diçû û dihat û biken ji me re digot:
-ez bihêvî me hûn şerm nekin mal mala we ye û ev şahî ji bo we çêbû ye.
min jî bi ken lê vegerand:
- birastî merov di mala te de şerm nake ji me weyê em li mala xwe ne lê ku tu wisa gelekî guh bidî me em dê şerm bikin û em ê rabin herin.

Çi cara zengilê derî lêdiket em ên rûniştî hemû dicefilîn û me hemiyan matmayî li derî dimeyzand, ka dê yê derbasbe, çawa be û dê kî be, ev zik tilêrîye û temenê wî 50 sal e lê ya pê re kî ye gelo?!, di cî de ya ku cejna bûyîna wê bû ji çavên me pirsa me nas dikir da ew û jina wî bi me didan nas kirin, ev yê din jî çuqasî dirêj e û jina wî ji ber wî ve kina-kine, ev yê din jî qut û qelew e û jina wî di meha xwe de ye, didu li gor hev tunebûn û wek hev derbas nebûn û çi yê ku derbas dibû mazûvanê me û jina xwe ya ku ji bo cejna bûyîna wê em hatine civandin bi me didan nas kirin.

Hin bi hin şahî fireh û mezin dibû, ji min pê ve kesek xort û bi serê xwe tunebû, min dizanî mazûvan û mazûvana me niha çi li ser min dibêjin, ji ber ya ku cejna bûyîna wê bû mûm vemirandin û peyalên meyê bilind kirin û li hev xistin û gato jî li hemiyan belav kir, lê yê min ez mîna latekî rûniştîbûm û min geh li yê zik tilêrî û jina wî dimeyzand û geh li yê tiliyên wî di nav porê wî de şîn hatibûn, min di nava xwe de digot û ji xwe dipirsî:
-gelo vê porkura wek kara xezalan çawa û çilo ev yê han kiriye?!. Ne tenê min li wî û li jina wî di meyzand û behetî mabûm belê li yê guh dirêj û bel, li yê simbêl boq, li yê bi lingekî, ne bi xêr ev bûye nexweşî ji min re ez bi kûranî li her tuştî dimeyzînim ta ku diya min gelek caran ji min re digot:
-tu ji biçûkaniya xwe de wisa rûşuştîye.

Bi rastî gelek tuştên ne normal hebûn lê çavên min li mirovekî bûn û nema ji ser wî diçûn, tiliyên wî ji nav porê wî dernediketin û her ku tiliyên xwe ji nav porê xwe dikişandin li serê wan dimeyzand ka serê wan ji xurandinê bûne bi xwîn an na û her ku ji nûve tiliyên xwe

dixistin nav porê xwe dibin çavan re li me tevan dimeyzand û madê wî pê re pê re zer û tal dibû, dema ku çavên hinan lê bû bilez destê xwe vedikşand, lê bi xwe nikarîbû, serê xwe bi dawiya danîşgehê dixurand yan jî bi dîwar dixist, dema nû ket derî bi dû jina xwe de bû û tiliyên wî di nav porê wî de bûn, wek tu derziyan di laşê min rakî min nema xwe girt, min ji yê li kêleka xwe pirsî:
-çi bela wî yê hane lo?!.
- kîjan..?
- ew ê ku devê xwe xistiye guhê jina xwe ..
- ew ê bi ya sêng mezin re ?
- na ..na ew ê jê bi wir de, yê ku tiliyên wî di nav porê wî de..
- êhhhhhhhhh........çi heye ?
- xuyaye tu ji min fam nakî!!
Hîn ez bi yê kêleka xwe re dipeyivîm ya kêleka min î din rabû ser xwe û bi lez ji şahiyê derket, helbet wê bi zorê xwe gihand tewalêtê çimkî dema rabû bi telkî dimeşiya, min çav da dostê xwe da ku li şûna wê danîşe, min jê pirsî :
-ew ê ku tiliyên wî di nav porê wî de ?
- êhhhhhhhhhh.. çi heye...?
- çawa çi heye..ji gava ku hatiye..tiliyên wî ji nav porê wî derneketine.!!.
- belê..belê min fam kir bê tu çi dixwazî bêjî..ew Sipî di serê wî de hene.!!!!
- Sipîîîîîî....?!! matmayî min wisa got û çavên min gazekê ji hev çûn, di vê demê de Sipî, di vê dema ku xelk gihiştine ser heyvê hîn jî Sipî hene ? di dema "computer û Internet" de, di dema av gihaştiye her mal û deverê, di dema ku bi melyonan celebên şampo û sabûnan hene hîn Sipî li vê dunyê hene..min ev yek zû bi zû bahwer nekir..!. Lê mêrê ya ku cejna bûyîna wê bû ango dostê min hişt ku ez beşdariya kêfxweşiya wî û jina wî û mêvanan bikim dema ji min re got:
-ez dê di dûv re çîroka wî ji te re bêjim…

Ya ko cejna bûyîna wê bû pirogramê şahiyê nivîskî li ser kaxezekê di destê wê de bû, helbet ew dê seroka şahiyê be, ku îşev ji me re bibêje bimrin em ê bimirin, ku bibêje solên xwe ji lingên xwe bikin û bi dara bi binê lingê me keve kesek ji me nabêjî na!! îşev şeva wê ye, dê miradê xwe li me mêran bikî û bi rastî jî gelek tiştên nedîtî bi me mêran kir bê ku nêzîkî jinan bibe, piçkên kaxezan li hev pêçan û avêtin ber me mêran û her mêrekî ji me bilez destê xwe avêt kaxezekê, wê got:
-yê navê çi canewerî jê re derkeve ew dê weke wî bike.
yê min navê mirîşkê ji min re derket û min weke mirîskê kir qid-qid, yê zik tilêrî wek sehan reya û kir ewt ewt û li ser her çaran rawestiya, yê guhbel û dirêj wek keran kir û ziriya û yê bi lingekî wek pisîkan kir, her mêrekî ji me wek canewerekî kir û her ji kurte demekê ya ku cejna bûyîna wê bû peyala meyê bilind dikir û digot:
- noşîcan be...

Me hemiyan peyal pê re bilind dikir û li hevûdu dixistin, wê wisa dikir da ku me mêran serxweş û mest bixe û di dawiya şevê de bi me bikene. Ji ber ku wê erê peyal hildida devê xwe lê hema tu zanî peyal dighand lêvên xwe û jê venedixwar, min jî weke wê dikir ji ber ku ez çêçikê mekînê me, min dizanîbû ew ji bo çi wisa dike û dê çi huneran di dawiya şevê de bîne serê me mêran, û birastî jî wisa bû, di dawiya şevê de hemû mêr ji bilî min serxweş û mest bûn. Bû tiq tiqa wê û jinan bi mêran keniyan, yê ku Sipî di serê wî de bûn nû madê wî geş bibû û bi ser hişê xwe ve hatibû, ji ber ku Sipî jî ji meyê benc û serxweş bibûn û nema serê wî dixurandin û ji ber vê yekê nema tiliyên xwe dixistin nav porê xwe. Hingî ya cejna bûyîna wê bû keniya sê caran verşiya û ya zik li ber dev beravêt dema li lingê min terpilî û jina yê zik tilêrî xwe şilfî tazî kir ji ber ku ew jî ji ser hişê xwe çûbû û yekser mêrê wê ew

berda, wê jî her carê peyala xwe hildida û qayîş bi mêran re dikişand. Katjimêr çar ê sibehê zo-zo mêvan di derî re derketin bê ku kesek ji xwediyên malê bi wan re derkeve û ji ber ku mêr serxweşbûn û xwe li ser lingên xwe nedigirtin jinên wan ketibûn bin çengên wan ta ku ew di derî re derdixistin ta ez bi tenha xwe mam, min ji dostê re got:
-de ka çîroka wî bêje..
- Zûde-zûde ji demeke dûr û dirêj de ji dema ku bapîrê wî Emperator bû Sipî ketibûn serê wî, dema çû ba textor, textor celebeke sabûn dayê û jê re got:
-rojê yazdeh caran tu dê serê xwe pê bişo, lê ku wî serê xwe yazdeh caran pê şuşt û di dema serê xwe di dawiya şevê de danî da ku razê Sipî bi hevûdu re peyivîn û ji hevûdu re gotin:
-îşev em dê têr razên, me zûde xwe ne şuştibû.
Bi dengê dîkan re careke din çû ba textor, textor jê re got:
-bikeve dawiya turumbêleke servekirî û bila yê ajovan turumbêlê gelekî-gelekî xurt bajo, helbet Sipî bi serê te ve ne şêrêz kirîne dê ji ber hêza ba ji nav porê te bifirin û tê ji wan rihet bibî.

Paşî ku wî wisa kir bi kêf û eşq serê xwe di dawiya şevê de danî da ku razê lê careke din bû piste-pista Sipîyan bi hevûdu re peyivîn û ji hevûdu re gotin:
-îşev jî emê têr razên, berî mirinekê em derketin sayraneke xweş.

Mêrê ya ku cejna bûyîna wê bû cihê xwe xweşkir çixarek pêxist û di nav çîrokê re got ku wî hêvî dikir ku Sipî bibin mih yan jî çêlek yan jî lîrên zêr, ma ku wisa bibe ne çêtire, wisa dê perên min çêbibin û ez ê ji Sipîyan rihet bibim!!.

Lê careke din çû ba textor û jê re got:
-here sûka serserî û qaçaxçiyan û şerekî giran çêbike lê şerê we divê bi poşanbe, di dema ku bi ya textor kir û xwîn jî bi ser serê xwe xist lê di dawiya şevê de û dema serê xwe danî ku razê careke din sipî bi hevûdu re peyivîn:
-em îro çûn şer me bîst û neh şehîd danîn lê me sed û bîst û çar ji wan dîl kirin.

Cara çaran berê xwe da textor, vê carê textor kûr di rewşa wî de ramiya û ji xwe razî jê re got :
-Serokê wan bikuj û wisa ew dê hevûdu biqelînin.
Kesek nizanî çawa û çilo gihaşt mal û bi tiliyên herdu destan li Sipiya herî gir û qelew geriya, ew girt û danî ser kevirekî û kevirê din bi hemû hêza xwe bi ser de berda ta ku xwîna wê pijiqî û bi ser kevirê din de herikî. Şeva wê rojê heyvanê xewê bi çavên wî neket, bi bû qîj-qîja Sipîyan, nav wan bi bû şer û ceng û ji hevûdu re digotin:
- ez ê bibim serok, ya din digot na ez ê bibim serok.

**Qamişlo**

# Serokê ji heryê

Her yekî ji me zaroktiya xwe bi şêweyekî derbaskiriye, lê zaroktiya min taybetiyeke xwe hebû, ne wek ya tu kesî bû. Helbet ez ê nikaribim hemî ji we re bêjim, lê bi kurtî navê min kiribûn şûmo, ji ber şûmbûn û bêciriya min, tenê bes bû ko tu bêjî şûmo êdî her kesî nas dikir mebest kiye, jixwe her kesî xwe ji min dikirî û xwe ji min diparast.

Mexabin zaroktiya min hemû nayê bîra min, lê niha û piştî ez bûme mêr yek caran ji dê û bavê xwe dipirsim, yek caran jî ji wan zarokên ko bi min re mezin bûn û xwe ji min diparastin, dipirsim, ma zaroktiya min çilo û çawa bû, niha ez bûme mêr û bi jin û zarok, zarokên min qet li min ne hatine, wek latan in, mêş di devê wan de mirar dirin, ka zarokên berê û ka yên niha, zarokên berê çûk bi şev ji qulên dîwaran derdixistin, bê jimar min mar ji qulan derxistine, min diranên wan hildikirin û wek tizbiyan bi wan dilîst, min dûpişk bera hev didan û bi wan dikeniyam. Roja ku diya min bigota: îro xwarin li malê tune, min wê rojê çûk li gund nedihiştin.

Min bê sînor û bê şerm pirs dikirin, pirsên bi rê û bê rê, pirsên fehşo mehşo, carekê min ji jineke avis pirsî: çima û çilo zikê te wisa mezin bûye?, piştî bi min de xeyidî, wê got ku ez wek diya xwe rûşuştîme û got here ji diya xwe ya ku bê deling diber bavê te de radizê, bipirse. Wê şevê xew bi çavên min neketin ta ku min bi çavên serê xwe dît, dê û bavê min çi ji hev û bi hev dikirin, ez heft heşt salîbûm lê bi min xweşbû dema min li wan temaşe dikir. Niha ez dikim û nakim ku karibim wisa bi jina xwe bikim, mexabin ez nikarim şipya bikim, yaho ma wan çilo dikir?.

Gelek nifir, derew û bêbextî li min dihatin kirin, bi taybetî dema min xwe şûm dikir û gelek gotinên wek: belqityo, sêwlekê hiram, bêjî, layê zinê, çîçkê mekînê, tircal, rojane li dujî min dihatin gotin. Min pisîk, ker û seh bi terî nehiştibûn. Ji tevaya gund ez û Dilber dost bûn, min wisa guman dikir ji ber ku dema ez didîtim dibû wek pisîk û parçak goşt û sisto misto dibû. cara pêşî min ew di nav heryê de dît, te digot qey pûtek ji heryêye, ta niha ji heryê û lîska bi heryê hez dike û tişt miştan pê çêdike. Nava wê ji min diqetiya, min û wê bi xanîka dilîst, min roj lê dikir şev da ez wek bavê xwe bikim, min çi jê dikir wê nedigot na, nizanim ne ji min ditirsiya ne jî pê xweşbû, lê em zarok bûn.

Hingî ku kulm û tep û ji her kesî li min diketin min her şev bi xwe û doşeka xwe de mîz dikir, hinan ji min re gotin ku ew kulm û tep ne li pişta min ketana min bi xwe de mîz nedikir, li gor dîtina wan kesan rovya mîzê sist bibû, êdî min nema dikarîbû ez mîza xwe bigrim û rawestînin, çi çaxî bihata wek cog diherikî, doşeka min rojane li ber tava rokê bû da ku zuha bibe û di şeva li pêş de li ser xew bikim û careke din pêde mîzkim.

Niha ez xweziya xwe bi wan rojan tînim, merov çiqasî mezin dibe huqasî hov û newêrek dibe. Jixwe berpirsyarî pişta merov dişkîne. Ji bo ku jina min li ber min wek pisîk be divê ez wê têr nan û av û ji tiştekî bêpar nehêlim, hun dizanin jinên vî heyamî ziman dirêj û qure û ji bavê xwe şerm nakin, bê neynik û mekyac narin pişt xanî, jixwe hin ji wan bi ser mêrê xwe de radibin û hin li wan dixînin, batil li vê ecêbê, bawer bikin dawya dinyê nêzîk bûye, ma jina berê ji ku diwêrîbû çavên xwe li ber mêrê xwe veke, jinên niha di pentelonên koboy de radizên. Ji bo ku jina te bi germî bi te re razê û ji te hez bike û ne çav li der be divê tu ji her alî de wê têr bikî. Min jî ji bo vê yekê her sibeh berê xwe dida sûk û çarcihan da ku bi karê rojane aboriya mala xwe bikim. Rojane du caran di riya çûn û hatinê de pûtê serok ez dirawestandim, nava min jê diqetiya, wek cendirmekî çav sor ez îfade dikirim, çima te navê kurê xwe kiriye Azad, çima te navê keça xwe kiriye Newroz û te navê sehê xwe kiriye Welîd.

Bi tirs min çavên xwe dixistin çavên wî û awir jê vedidan. Di meydana ku bê erêya wê pûtê serok lê hatibû danîn her çavek bi sed çavîbû.

-xwezî min bikarîba ez te bi dû xwe de bikişkişînim malê, min dizanîbû ez çi ji te bikim.

Li gel ku min di wê rojê de karîbû ez jin, keç û kurê xwe Azad kêfxweş û şa bikim, dema min bi keda wê rojê sê kîlo pirtiqal, yek û nîv sêv û du kîlo mozên xerabe bibim, lê ez xemgînbûm, ez gêjo mêjo bûm, ez ne mêrbûm, jin bibû mêr û ez bibûm jin, wê kir û nekir ku min germ û har bike da ku agirê di nava xwe de sar û vemrîne, nikarîbû.

-dev ji min berde, kirina te bê sûdeye… Bi xeyd pişta xwe da min û bû kufe kufa wê, min jê re got:

-ta ku tu pûtekî serok çênekî, tu bi dê û xuha min bî…

Ku çêbiba dê wê şevê raba û pûtê serok çêkiribaya, ne min ji we re got ku Dilber di zaroktiya xwe de ji heryê hez dikir û tişt û mişt pê çêdikirin, jixwe dema min ev yek jê xwest wek çûkekî ji qefesê bifire, madê wê geş bû û bi kêf serê xwe danî. Ku Maykil Encîlo baya wisa bilez û xweşik û spehî pûtê serok çênedikir, dema çavên min î girtî li ber pût vekirin min ji çavên xwe bawer nekir, min bawer nekir ku wê çêkiribe, te digot qey te serok bixwe di axur de daniye, mabibû ku biaxive û fermanan bide, cara yekemîn bû ku çavên xwe bê tirs dikim çavên wî, min biser de mîz kir û sê tif danê û min got:

-niha Dilberka min li benda min e, sibe tê xwe bibîne.

min got û pirsî:

-keçê ev kê çêkiriye?

-bêhn û cenga laşan!

-ango te çêkiriye?

-niha ez dê û xuha te me yan ez jina te me?.

min ew bi germî hembêz kir, jixwe ez hemî bûm bi herî.

Pûtên serok û xizmetkarên milet û welatan wek ê Napolyon, Nîlson Mandela, Xandî û C. waşington hatin bîra min û çilo miletên wan ew di meydanên bajarên mezin û paytextan de danîne û bejna xwe ji wan re ditewînin û li ser tabloyekê kurte jiyan û çend gotinên pesindariyê nivîsandine, min jî li ser pûtê serokê ji heryê nivîsand: ´´serok miletên xwe ber bi asmanan de tajon te em wek pez ber bi zindanan ajotin. –serok dibistan û zankoyan vedkin te zindan û girtîgeh vekirn´´.

Di îfada yekemîn de min jê re got:

- niha tu li ba min girtîye, ma wilo xweşe?,, bêje te çend kesên bê guneh di zindanan de û di bin eşkencê de kuştine, lê ez wek te nakim, ez te nakujim, ji ber ez merov im, belê ez ê te bixum, ez ê te daliqînim, na ez wisa nakim, ez te rihet nakim û xwe wek te hov nakim, ez ê te dax bidim, ez ê bi şîşa sor li ser anya te binivîsim´´ ez hov im, ne merov im´´.

Ji ber hêrsa di nava xwe de ez rabûm min bi ser de mîz kir û sê tif danê û li beramberî wî rûniştim.

ez îşev westiyam, em ê sibe berdewam bikin.

Niha hun ji xwe dipirsin ka wê di îfada duyemîn de çi bibe, lê ez ji we re nabêjim min çi kir, hun jî dikarin pûtekî wî peyda bikin û îfada wî bistînin, da ku hun wû kelizê tam bikin, lê ji we bi hêvîme hun wî neêşînin, gunehe.

Di roja din de dema ku ez çûm axurê ku pûtê serok lêbû ji bo îfada wî ya duyem bistînim, min ecêb dîtin, ez ji darkê ketim, min pûtekî şikestî wek termekî li erdê dirêjkirî dît, û misînek av, teşt, şeş heft gaz hîzar, pîlikek sabûn û li ser pelekî ev hevok hatibû nivîsandin”qenciya ku merov bi miriyan bike veşartine”.

**Partiya malbatê**

Malbata min mezin e, tîmeke gogê bê yedek jê çê dibe, xanima min Nazê dê sedî li sed golar be, ma ji golariyê pêve ew kare li ku bilîze. Em yazde kes in, ev jî ne bi destê min bû, bi tiştekî din bû, biborin nikarim bi nav bikim, Nazê xwe şayîk dikir û ez jî har dibûm û êdî hun dizanin. Te kengî ew bidîta zik li ber dev bû. Ez û xanima xwe Nazê û neh zarok, ez dibêjim zarok ji ber ko ta ez sax bim ezê wan zarok bibînim, dako ji wan hez bikim, û karibim car carnan bi wan de bixeyidim û li wan bidim, zaroka mezin keçe, û ev ji bo min gelekî başe çimkî rojekê ji rojan dê nebe seroka partiyê, ma dibe jin bibin serokê mêran, jimara heştan kur e lê gêje, ma naxwe ew jî bi kêrî serokatiya partiyê nayê, jimra heftan dîsa kur e lê ne tu kur e, ko mêş di devê wî de bimrin ew nabê kiş, jimara şeşan keçe, ew dikare bibe cîgirê serok, jimara pêncan kur e, ew dikare bibe hin cîgirê serok hin jî sikirtêrê giştî, jimara çaran û sisiyan keçin, jimara didwa û yekê kur in, jixwe tirsa min ji her duwen biçûke, ko rojekê li min har bibin û cihê min bigrin.
Di van deman de axaftina di derbarê danheva pereyan de pir bûye, hemû bi Dolar û Euro daxêvin, û merov bêtir kesên perelî dipejirînin, merovê ko pereyên xwe bi diziyê jî dabe hev mexabin merov wî dipejirînin. Kurdayetî jî di rewşeke ne baş deye, baweriya kesan bi partiyan kêm bûye, ji hevûdû re dibêjin; çima partiyek me û welatê me rêzgar nake.
Niha navekî din bi dû wan ketiye, hin dibêjin bûne wek katjimêra bi dîwaran ve daliqandî, çiq çiqa wê ye, lê ko pîl vala bû diraweste û dibe ji avêtinê re.
Em li hevûdu rûniştin û civiyan, me telefonên mal û destan girtin û li ser maseyeke gilover rûniştin, yekî ji wan nizanîbû çi heye û çîrok çiye, di bin çavan re li hevûdu dinêrîn û bibû piste pista wan, ji ber ez hin mezin û hin jî bavê wan im gerek ez dest bi axaftinê bikim, dako biryara axaftinê li ba min be, min got:

-emê tiştekî mezin çê bikin..

ji wan weyê ko ezê kar û barê malê li wan dabeş bikim, kî dê bi dengê dîkan re nan bîne, kî dê taştê amade bike û kî dê li telefonan vegerîne û her wisa, lê min dîsa gotina xwe dubare kir:

-na na emê tiştekî mezintir çêbikin.

Vê carê hiş û ramanên wan bêhtir dûr çûn, lê dîsa min ramanên wan birîn û ew vegerandin ser maseya gilover, min got:

-emê partiyekê ji xwe damezirînin, tenê ji xwe!.

Dema min wisa got wek tu denek ava sar bi ser wan dakî û di bin çavan re li hevûdu nerîn wek yek ji ê din re bêje; ev çi top bû bavê me teqand, ma partî ji neferên malekê çê dibin. Ji bo ko ev yek bibe yeqîn û bawerî min sî xulek bênvedan da wan. Di bênvedanê de min bi dengekî bilind qîr û bang kir:

-bi tu şêweyî nabe hun ji kesîre bêjin ha, yana emê hemû av û av biçin..

dengê ê biçûk hat û ket qula guhê min û tinazên xwe bi gotina min kir; wê bavê me partiyan çêke û ji niha de ditirse. Jixwe dema em piştî bênvedanê dîsa civiyan wî ev yek anî ziman. Jimara çara Gulê pirsî:

-ji boyî çi nabe kesekî din ji derveyî malbatê bibe endam?.

-ji boyî cihê bavê we jê neyê standin, Nazê wisa got û di ber xwe de keniya. Ji bo ko têde bighêjin çima nabe kesek ji derveyî malbatê bibe endam, min diyar kir ko piştî em partiya malbatê damezirînin û her yek ji me bibe berpirs û cihê biryarê em dikarin her kesî bikin endam, ew ên ko dê nikaribin bibin tiştek û nebin xwedî biryar û cihê bilind di welatê rêzgarkirîde negrin, ew welatê ko emê rêzgar bikin dê welatê me be û di destê me debe, ma dibe yekî din hazir mazir bê li ser tac û eywanan rûnê. Jixwe nabe em kar û xebatê bikin, xwe birçî û tazî bikin dako welat rêzgar bikin û yê din amade were û li ser tac û eywanan rûnê û bibe serokê me, an jî wezîrek ji wezîran, xweda jî vê napejirîne. Em wek gotina pêşiyan nakin’’hinek dikin û hinek dixwin”” emê bikin û emê bixwin.

Me bi şêweyekî demuqrat xaleyên girîng nivîsandin û axaftin da Nazê ji ber diya wan e û ji me hemiyan mezintire, jixwe her yek li gor hiş û ramanên xwe daxêve û bîr û boçûnên xwe tîne ziman, ma jina ko jiyana xwe di anîna zarokan û xwaringehê de borandibe wê çi pirsan bike:
-ko kurekî min hate girtin, emê çi bikin?, ez bi xurtî li dujî siyaset û miyasetê me, serê ne êşe nehewceyî girêdanê ye, merov qedrê dizekî perelî ji yê siyasetmedarekî bêtir digrin.

Ji bo ko ez kesayetî, bîr û baweriya wan bi wan xurt û bilind bikim, min yek bi yek li wan nerî bi wateya ko kî dikare bersivê bide, du sê nerîn hatin ser masê lê ne wek ya min bi nirx bûn:

-bila navê ên din hemûyan bide dako em hemû bên girtin û em hemû bibin lehengên gel û azadiyê, jixwe ko merovek tê girtin û dikeve zindanan bawerî bi wî û partiya wî xurtir dibe, û em dikarin di girtîgehê de kar û xebata xwe berdewam bikin û partiyê birêve bibin.

-doz û daxwazên me dê çibin?. Narîn pirsî, jixwe me di destpêkê de diyar kiribû ko emê bi şêweyekî gelekî demuqrat li hevûdu guhdarî bikin. Dîsa gelek nerîn û dîtin hatin ser maseya tije pel û pênûs, ê ko got parastina mafê jinan, ê ko got mafê axaftinê, jixwe hinan li gor rade û hewcedariya xwe xwestekên xwe gotin, wek xwarin û vexwarin pir bibe, mûçe bilind bibe, stadyona bajêr mezin û fireh bibe, biskilêt li şûna turumbêlan bên bikaranîn. Dema ez axivîm û min got ko ev ne armancên partiyane hemû keniyan û tinazên xwe bi min kirin; ê me ev daxwazên me ne û em ji wan danakevin. Min bi serhişkiya xwe diyar kir ko armancên partiyan ne wisane, û emê tenê sê tiştan bixwazin, emê Serxwebûn, azadî û yekîtiya kurdistanê bixwazin û hew, çi çaxa her sê pêkhatin xwestekên we jî pêktên, em tiştekî din naxwazin û herin xaleya din çaxê min gelek nîne.

-ko stadyona bajêr mezin û fireh nebe ez ji niha de ne endamê partiyê, ê biçûk got.

-yabo di xewnan de jî emê nikaribin van daxwazan pêkbînin?, sêwlekekê pirsî, ez bawerim Narîn bû.

-jixwe di xewnan de em karin pêkbînin, di xewnan de nebû di xewnerojan de. Min got herin xaleya din û bila çaxê we di gotin û motinên vala de neçe, miletên pêşketî çax û dema wan ji zêre, qet vala derbas nakin, em çima ewqasî dikin lewte lewt. Jixwe ji niha û pêde divê çaxê we vala derbas nebe, neqşan çêbikin, selikan çêbikin, ko tiştek tunebe hun bikin hema biramin, di çi debe bila bibe, raman hiş û mejî mijûl û çalak dike û li pêş dixe. Min ji wan re diyar kir ko ez dikarim pênc roj û pênc şevan li ser hev biramim û di vê yekê de baxêvim, lê ez naxwazim serê we biêşînim. Bazo fermo dora teye.

-emê bi çi şêweyî kar û xebatê bikin?.

Nizanim çilo hat ber devê min û min got ko em kar û xebatê nakin, bû piste pista wan û pêre deng bilind bûn, jixwe yekê ez bawerim Fatê bû got ko hîn serxwebûn, azadî û yekîtiya kurdistanê jî dixwaze, min diyar kir ko em dikarin li ser şaşî û kêmasiyên partiyên din mezin bibin, mexabin hevalan ev yek fam nekirin, êdî diviyabû ez ji wan re şirove bikim. Emê daxuyaniyan bi navê partiyên dî belav bikin, û helwesta herî qels û li dujî berjewendiya milet û welat têde binivîsin, dako milet ji wan nefretê bike û dûr bikeve, di eynî çax û demê de emê daxuyaniyan bi navê xwe belav bikin û helwesta herî mêrane têde binivîsin û diyar bikin, ango helwesta mêrane, mane gotinin, ev yek dê endamên wan ji wan dûr bixe û dê bibin endamên partiya me, vê yekê li serokê xwe bihêlin, tiştê ko nasnavê min çêçkê mekînêye. Niha yek ji we dikare bipirse; emê li kur û çilo belav bikin?, ev raste, ma hun nizanin malperên Internet bûne wek ax û xwelî, ew ji xwedê dixwazin ko hema yek şaş bibe û tiştekî ji wan re bişîne, jixwe pirên wan bi kurdî nizanin bixwînin û binivîsin û ev yek di berjewendiya me deye, bêguman dê hemû ji me re belav bikin çimkî qayîşê bi hevûdu re dikşînin, jixwe em dikarin malpereke serbixwe bi navê Narîn vekin û her tiştê xwe têde belav bikin.

-çima bi navê Narîn?, bila bi navê min be. Simko jimara pêncan wisa got û di cihê xwe de sar û mad tirş li benda bersiva min ma.

-ji ber ko Narîn jin e, ma tu jin e ?, fam bikin ha, ma divê ez her tiştî şirove bikim, we bi pirsên xwe î xiloxavî qirka min zuha kir, malperek bi navê te heye, ya Şikakiyan, ma te nediye ?.
Min dixwest em bi hevûdu re partiyeke mezin damezirînin. Ji bo neferên malbatê tiştekî nû bû, lê balkêşbû jî, piştî min ji wan re diyar kir ko her yek ji me dê bibe tiştek, kêfa wan hat û hinan ji wan eşkere kir û gotin ko dixwazin bibin wezîr, min jî ev yek pejirand, jixwe daxwaza me ya sereke rêzgarkirina kurdistanê ye, ko me rêzgar kir helbet emê bibin berpirsyar, ma bila hin din bibin serok, serok wezîr, serokê parleman û wan kesan tiştek nekirine, na emê bikin û emê bixwin, jixwe me di civîna borîde cîgeh li hevûdu parkirin dako pirsgirêk dernekevin. Ez serok komar, Nazê wezîra aboriyê, Simko serok wezîr, Narîn seroka parleman, û me qolo kir wezîrê karê derve ji ber fen û fûtên wî yên pir, ew dikare fen û fûtan li cuna bike, carekê em tî birin ser avê û tî vegerandin. Du merovên wek Nazê çikûz nînin, dikarîbû bi hêkeke du zerdik êlekê têr bike, jixwe ez kes ji min pêve nebû ko bibe serok, serokê hemiyan, kesî jî xwe neda pêş, wê demê min pirsî ; ma em daxînin dengdanê ?. ne kesî got erê ne jî na, êdî ez bûm serok, min nedixwest tev li kar û xiricira siyasetê bibim, lê ez hin bê kar im û hin jî ez hez dikim xizmeta milet û welatê xwe bikim, ma ko ez nekim kî dê bike, hema ezê dema xwe pê dagirim û xwe pê mijûl bikim.
Di partiya me de sê duruşmeyên bingehîn hene ;

-ji hevûdu hez kirin.

-li hevûdu guhdarî kirin.

-hevûdu pejirandin.

Dema em bi van duruşmeyan daketin nav milet, devê wan ji hev ma û ji hev re gotin ev ta niha li kur bûn yaho.
Dema em daketin nav milet me wek partiyên din nekir, me ji tecrubeya wan sûde wergirt, jixwe kes wan partiyan bi menteliyekî nakire, me berevajî wan kir, wan çi digotin me berevajî wan dikir, dema digotin emê welat rêzgar bikin û em partiya herî mezin in, em li dujî wan dernediketin, lê me tiştin din dikirin me pê dihişt ko milet wan nas bike ko derewan dikin, bê bextiyan dikin, êdî dest bi şerê me dikirin, em dikirin dizê şekala me, ji dujmin bêtir şerê me dikirin, jixwe dema şerê me kirin em biserketin, em li ser pişta wan ava bûn.
Ko hewcedariya milet bi partiyeke wisa nebiwa me ne didamezirand. Kes wek me nizane navan bêje û bike rêz, dema yek ji me di civîn û civatan de daxêve navên rêber û serdarên dunyayê ên ko milet û welatên xwe rêzgar kirine, hemiyan tînin ziman, wek ; Hoşemin, Tişî Cîvara, Maw, Garîbaldî, Pasmark, Şêrîn Remo, Folter, Robespîr..û me tecrubeya her yekî ji wan şirove dikir, devên wan ji hev diman û ziq li me dinêrîn, me gelekî dixwend dako em bibin rewşenbîr û em bi kurdiyeke paqij û zelal diaxivîn, ev jî ji bo milet palkêş bû, dema wan serok û rêberekî partiyên din didîtin ji xwe bawer nedikirin, ji guhê xwe bawer nedikirin, sê par axaftina wan bi erebî bû û qaşo bi kurdî diaxivîn. Dema em bi xurtî daketin nav milet me gelek tiştên balkêş ji bo li pêşxistina partiyê dîtin, me dît ko milet ji guhertinan hez dike, ji guhertina serokan hez dike, êdî me biryar da ko her ji mehekê yek ji me bibe serok, jixwe ev yek bû sedema ko gelek endamên partiyên din dev ji partiya xwe berdin û bikevin partiya me, ta ko em bûn partiya herî mezin, bi hezaran, belê bi sed hezaran endamên me çêbûn. Piştî sê salan û di civîma demsala buharê de jimara endaman giha şeşsed û çil û du hezar û pêncî û heft endaman.

-çi pêşniyarên we ji bo pêşeroja partiyê hene ?, min pirsî.

-bipirse ka em ji bo pêşeroja xwe çi bikin ?, Nazê got.

-min fam nekir ?.

-ko her endamek bîst û pênc kaxezan bide emê bibin melyonêr !.

-endam dikarin alîkariyê jî bidin hev, Qolo got.

Carekê derfet peyda dibin dako merov bijî, ma ezê çend caran bijîm, jixwe ko merov kurd be û xwîna kurdewariyê di damarên merov de bigere, merov dikare bi gelek şêweyan ji kurdîtiya

xwe re bike, ma ez tenê kurd im, ma kurdayetî ma para min, tiştê ko min ji kurdayetiyê re kir kesî nekiriye û kes nake jî. Ne tenê perîşan, parsek û belengaz dikarin kar û xebatê ji bo azadiyê bikin û êzingên şoreşan bin, va ez melyonêr im û rojnameyekê derdixînim, ez niha melyonêr in û dikarim bi gelek şêweyan alîkariya gel û welatê xwe bikim, ma kesek dikare li dujî alîkariya min derkeve. Ta niha ji her kesî weyê ko zengîn û dewlemend kar û xebata welatperweriyê nakin, hema va ez dikim. Va ez rojnameyekê derdixînim û min navê wê kiriye kurdistan, de bila her kes têde bi azadî binivîsîne, û ez bi hezarên Dolaran di berde ji bêrîka xwe didim, de fermo derdê xwe têde bêjin û ko hun bixwazin hun dikarin rexneyan li min jî bikin, dunya azadîye..fermoo..rahijin pel û pênûsan û binivîsin ma kesekî bi we girtiye.

Li ser textê razanê, li Elmanya û berî ko Nazê binmêr bibe got : min niha fam kir û hat bîra min te çima partî çê kir..hi hiiiiiiiii...tu çi bi ecêbîîîîîîîî...ava hêdî min ecêb jê dî.

2004, Holenda

## Ji xemgînî partiyek damezirand

Berî demekê ez li Englistanê, li mala dostekî kevn bibûm mêvan, şahiya rojbûyîna kurê wî bû, min li wir merovekî xemgîn naskir, xemgînî jê diniqutî, lê xwînşêrîn bû, û navê wî Silo bû, min jê pirsî; tu çima wisa bêmadî kekê Silo?, tu hîna ciwanî, wî got:
-ez xemgîn û bêkarim!
-çavekî min birje, tu çima xemgîn û bêkarî?
-nizanim, ez tim xemgîn im, li gel ko hin caran helbestan dinivîsim.
-wensekê boyî xwe çê bike.
-wek çi?,
-hevala te tune?
-na,
-ma komputera te jî tune?
-belê heye.
-naxwe partiyekê damezirîne.
Diyar bû pêşniyara min ketibû serê wî, çimkî pêre pêre madê wî xweş û geş bibû.
Piştî vegeriyam Holenda bi hefteyekê min telefon jêre vekir û pirsa rewşa wî kir, wî got:
-xwedê xêra te ji wê pêşniyarê binivîsîne, yaho ez nema vala dibim serê xwe bixwirînim.
-te dît Silo, wa tu jî bûyî serokek.
-na lo, tenê ez û komputera xwe ne.
-ma tu kar û xebata xwe bi çi şêweyî birêve dibî?
-di koşkên Paltalkê de.
-paltalk çi ye?, şoreş e, serhildan e, çi ye?
-na lo, mîna koşk û odeyên muxtar û axayên berê ye, lê bi riya Internetê dibe, tenê navê axa û muxtaran bûye admîn.
-bijî, jixwe partiyên koşk û Paltalka ji me kêmbûn.
-lê yaho dema min ji bo nivîsandina helbestan nemaye.
-kuro te serê min xwaro tê çi ji nivîsandina helbestan girêde, ew tu nanî nade te.
-yaho min jî got ezê ji bo çand û wêjeya kurdî çend gotinan li hevûdû siwar bikim.
-ma xwendin û nivîsandina te bi kurdî baş e?
-jixwe ji ber ez zanim bixwînim û binivîsim helbestan dinivîsim, yana ezê çi jê bikim!.
-bijî, naxwe her yekê bi kurdî zanibe bixwîne û binivisîne gerek bibe nivîskar?
-min ji bo nivîsandinê û ne ji bo xwendinê xwe fêrî xwendin û nivîsandina bi kurdî kir, lê niha nema helbestê dinivîsim.
-çima?
-ava siyaset û helbestnivîsandinê bi cogekê de nare.
-çawa bi cogekê de nare ma Hoşyarê Qamişlokî û Mervanê Qemer çawa dikin?
-yaho de ka em mijarê biguherînin lo, li ba me kurdan her tişt dibe.
-de başe Silo can, serkeftin boyî te, ta careke din û min ji bîra meke ha...
-xwedî li xwe derkeve, sipas ji bo lêpirsîn û telefonê, û bi soz û peymana mêrê berê ko min kurdistan rêzgar kir û bûm serok ezê te bikim wezîrê aboriyê.
-mala te ava..dem xweş.

22/10/2006

**OO7ê Şewatê**

-yadê qurbanê du hêkan bide min.
-tê çi bi wan bikî kurê min?
-ezê bi hevalên xwe re biçim Sînemê.
-ev ji riya bavê me kêmbû, ji ber çavên min biqeşite berî ko bi şekalê bi te kevim.
Cemo yê neh salî xweziya xwe mîna leşkerê di cengeke têkçûyî de bişke daqurtand û di cihê xwe de mîna latekî sar ma.

Dema careke din du hêk ji diya xwe xwestin şekalek lewitî li nav çavên wî ket û kelogirî bazda kolanên bajêr.

Piştî li merovekî zerik, bi tireşkot û bernêt rast tê, du firingan jê dixwaze û di dûv re winda dibe, şopa wî namîne û beta weta dibe.
Cemo yê ko filim di tenekeyên vala de pêşkêş dikir, dixwest cudahiya di navbera filimên ko ew di tenekeyên vala de derhênan û pêşkêş dike û ya cîhanî de bibîne, binase û bibîne bê ka filimên wî ji ber ên cîhanî ve di çi radeyê de ne, kîjan çak û li pêşe.

Cemo tenekeke vala tanî, bi bizmar qulek di nîvê wê de dikir, ji hindur ve pelekî sipî li rastî qulê dizeliqand, rola sê çar zarokan li wan belav dikir, piştî ji wan re şirove dikir, serê xwe dixist tenekê, qapûtê bavê xwe jî bi ser serê xwe û tenekeyê dadikir dako hindurê tenekeyê reş û tarî bibe, îca zarokan rastî qula di tenekeyê de çi bikirna siya wan li ser pel çê dibû. Ta wê rojê Cemo guman dikir ko sînemeyên dunyayê hemû filimên bi wî şêweyî pêşkêş dikin, ko ne bi wî şêweyî bin jî, cudahî dê di holan de be, li ba wan gelek merov dikarin bi hevûdu re di holekê de li filimekî temaşe bikin, lê li ba me hîna holeya me tenekeke vala û ji bo yek serî û yek merov dikare li filim temaşe bike.

Piştî lêdana şekalê Cemo nezivirîbû malê û diya wî jî lê nepirsîbû, lê dema bêhna goştê şewitî tev li dûmanê bû û mîna ewrekî qehwe û lewitî girt ser bajêr û bê destûr ket her malê de, û asmanê herêmê bi qîr û hawaran avis bû. Dilopek xwîn niqutî ser dilê diya Cemo û berteva şîvê ji destan ket, di wî çaxî de mêvanên wan hebûn, xwest bi dengekî bilind qîr û hawaran vede, lê ji şerma dikir bixeniqe.

Ji wê rojê de, ji roja ko agir û şewatê Amûdê daqurtandin û navê şewatê li bajêr bû, wê Cemoyê xwe nedîye, lê çi cara James Bond 007 di televizyonê de dibîne dibêje:
- wa kurê min, ew Cemoyê min e.

05/11/2006

**Ma homo jî mêr in!**

-rojbaş..
Bi ken Wisa got piştî ji danîşgeha kêleka min rabû û li Nijmegen ji Tirênê peyabû, min ji guhê xwe bawer nekir û ji xwe pirsî: -çilo ev a por zer û çav kesk bi kurdî dizane yahoo?. Ji bo ez xwe razî bikim min bersiva xwe jî da; dêmek hevala yan jî jina kurdekîye, dibe hevûdu berda bin jî, ax ji destê min çû, lê ez mam behetî.

Ez û mêrekî Holendî beramberî hevûdu rûniştîbûn û em daxêvîn, axaftina me jî germ û ne normal bû, mêr dûr be ji van deran Homo bû, li dor min gerya û ne geriya, kir û ne kir ko min bike hevalê xwe, nikarîbû min razî bike, dema ji nepejirandina min bê hêvî bû destê xwe dirêjî bêrîka çakêtê xwe kir û qeflek pereyên €20 derxist û yek ji wan bi hêviya girtinê re dirêjî min kir, dema min jê re diyar kir ko ez van tiştan nakim, madê wî tal bû û xwezya wî di ber de ma. Wek ez dizanim li van welatan kesek ewqase pere di bêrîka xwe de na veşêre û bêrîka xwe nake bankek piçûk, merov di bankan de pereyên xwe hiltînin, dêmek wî ji bo yên weke min bi pereyên xwe bikire, bêrîka xwe kiriye mîna bankekê. Min ji dest wî negirt. Jina Holendî jî di bin çavan re li me temaşe dikir û bi me dikeniya. Mêrê Homo ez vexwendî şahiya bûyîna xuşka xwe kirim, jixwe ew li ser riya çûna ba wê bû, min lêborîn jê xwest û min derew lê kir û got:
- diya min bi tenê li mal e. Dema li Arnhem peyabû bi ken re kerta xwe da min û destê min guvaşt, ta ko Tirên bi rê neket ji ber pencereyê ne liviya, ta ko min ew didît destên wî bilind bûn û carnan bi wateya telefon bike di bir ber guhê xwe. Min li kerta wî temaşe kir û xwend-navê wî Jan ter Horst e, navnîşan û telefona mal û destan jî li ser bûn, ne diyar bû ew çi karî dike, dêmek ji bo nêçîr û van tiştik miştikan ev kert çê kiriye, min bi ken di nava xwe de got:-gelo vî kesî kerta xwe daye çend kesan, ileh carekê tora wî ber bigre..

Wê rojê ez ji Dordrecht vedigeriyam malê, ez li rawestgeha bajêr li benda Tirêna xwe bûn, dema jineke dengxweş bi microfonê bang kir û rêbiwar agahdar kirin ko tirêna biçe Amsterdam dê 15 xulekan dereng bê, û ya ko biçe Roosendaal dê 20 xulekan dereng bê û ya ko biçe Zwole dê 30 xulekî dereng bê, ji xwe ya dawî tirêna min bû, ezê bi wê tirênê ta bi Zutphen biçim û li wir ezê bi tirêneke din ta bi gundê xwe biçim. Min di ber xwe de got: ev çi bela van tirênan e îro?, Jan ter Horst ber bi min ve nêzîk bû û pirs kir: bibore te çi got?, dema ez berî wî li tirênê siwar bûm hat û li beramberî min rûnişt.

Wê demê ez gelek caran diçûm Dordrecht ba hevalekî kevn û tije gotin û qerf, û ba hevala xwe ya ji min bi gelekî dirêjtir, jixwe piştî çend mehan û ji bo qama min î qut dev ji min berda, tim gazin dikir û digot ez dixwazim tu şipya min hemêz û maç bike. Di dûv re min çîroka xwe û Jan ter Horst ji hevalê xwe re got, wî navnîşan nas kir û got ko carekê mêrekî wisa kerta xwe dabû wî jî, piştî min çîrok hemû jê re got, wî bi ken pirsî:
-qûn jî jê û pere jî jê?.
-dêmek qûna wî dixwire.

Ev ne cara pêşîye ko ez rastî kesekî Homo têm, çi di min de bala wan dikşîne nizanim, pirca bi laşê min ve bi meymûnekî ve nîne, werîsek jê çe dibe, tiştekî balkêş di min de nîne, îca çi xwîna min bi wan şêrîn dike ez jî nizanim, ta bi jinan ji min hez nakin tako bi wan re neaxêvim, jixwe jin ne wek mêra ne, li yekî xweşik û spehî û bi pere digerin, her sê şert û merc jî di min de peyda nabin. Li gel ko ez wisa me jî ez qet bê dostik û hevalk nema me, dema ez bi wan re daxêvim ez wan bê hiş dixînim, wek tu derziya bencê li wan bixînî, ez wan gêjo mêjo dikim, carekê hevalekî tiştek ji min re got:

- tiştekî xweşik di te de nîne û dilê jinan ji te dixele, lê hema ko tu bi wan re daxêvî bi te ve dizeliqin, bi te ve dibin benîşt wek gena bi pez bigre.
Dema ez gihaştim malê, kertek ji Dorin di posta min de bû, ez vexwendî şahiya rojbûyîna xwe kiribûm, Dorin dostikek min î kevn bû, ji min pir hez dikir, du sehên wê hebûn, ji ber ko min ji wan hez nedikir dev ji min berda û yekî xwe î din dît. Dema ez gihaştim rawestgeha Apeldoorn keçeke bîst û du salî li benda min bû, hingî xweşik û spehî bû te fedî dikir lê binerî, du sê caran hêzeke dînitî hat min ko dest bavêjim memikên wê, ez bê hiş xistim, min jê pirsî:
-hevalê te heye?
-na û çênabe jî,
-ez karim nas bikim çima?.
-yekemîn car ez bi biyaniyekî re razam, ez gelekî êşandim, wê rojê min biryar da ko ez bes bi mêran re razêm.

Li ber derî min Dorin hembêz kir û sê caran çûm rûyê wê. Şahiya xwe di saloneke piçûk de çêkirbû, peyala Vijnê di destê min debû û di nav mêvanên wê re hêdî hêdî dimeşiyam û min çavê xwe li yeke bi tenê û xweşik digerandin, jinekê peyala xwe li ya min da û pirsî:
-tu li kesekî taybet digerî?.
-na, noş.

Wê jinê anî ziman ko du zarokên wê hene û bavê wan di dawiya şeveke payîzî de ji meyxanê vegerya malê û wê şevê di nav nivîna wê de raneza, piştî lê pirsîbû, wî diyar kiribû ko bûye Homo. Di dema ko ez û wê daxêvîn mêrekî simbêl boq ber bi min ve hat û peyala xwe li ya min da û got:
-noş.
-noş.
-tu mêrekî balkêşî!.
-bibore, ez têde negihaştim.
-ez Homo me, ez bi gelek mêran re razame, ez hest dibim tê ji hemiyan mêrtir û bêtir min kêfxweş bikî, eger tu bixwazî, te çi got?.
-min got ji ba min biqeşit.
-ezê ji bo her carekê hezar Euro bidim te.
-tu melyonekî jî bidî ez van tiştan nakim. Min wisa got û ji ba meşyam û çûm ba Dorin, min jê re got:
-mêvanên te ne normal in?.
-her çûkek bi refê xwe re difire, wisa got û çû di guhê yê Iranî de kir pistepist, ê ko ji nêr û mêraniya wî deng mabû, wekî din te nizanîbû ko mêr e, jixwe dema dimeşya te nizanîbû ev mêr e û ji jinan sêksîtir bû.

Jin û mêrên Homo berevajî hev in, bi kêmanî ji bo min û bi min re, ez hez nakim dilê wan ji xwe bihêlim, lê nikarim tiştekî ji wan re bikim, ne ez karim bazdim ser wan ne jî wan bera ser xwe dim. Jan ter Horst daxêvî û jina Holendî guhdarî dikir, wî digot:
-manen zijn beter dan vrouwen( mêr ji jinan çêtirin).
-neeee, vrouwen zijn de beste voor seks ( naaaa, ji bo sêks jin ji mêran çêtirin).

Her yekî ji me nerîna xwe digot, min wek merovekî xwezayî û ji jinan hez dike û wî wek merovekî nexweş û ji mêran hez dike, ango qûna wî dixwire.

Ez têde nagihêjim çima ewqas merovên ne xwezayî rastî min tên, ev hest bi gulê re jî çê dibe dema mêşên hingiv li dor digerin, lê diyare ew pir bûne. Ez bîst û yek salî bûm û hîna ez

diketim çavan, ez hîna dihatim xwarin, min li bajarê Dêra Zorê dixwend, îca ko tu li Dêra Zorê bî gerek car caran tu herî ser çemê Ferat. Li Dêra Zorê û li ser çemê Ferat pira daliqandî heye, bigir hezar mitir heye û taxa Hewîqa bi Cinêne ve girê dide û tenê ji bo çûn û hatina merova ye, berê turumbêl jî di sere diçûn û dihatin, dema turumbêlek diket ser pirê ya din li aliyê din li bende dima. Ber êvarî bû, dinya pir xweş bû, ez jî li ser pirê me, min destên xwe danîne ser hesnên pirê û li ava Ferat temaşe dikim, ji tevaya pirê mêrek kiras spî û bi Igal hat û li kêleka min rawestiya, xwe nêzîkî min kir û destê xwe bi nazikî danî ser destê min û firkand, nava min qetiya, dema min destê xwe kişand, destê xwe kir bêrîka kirasê xwe û qeflek pereyên 500L derxist, mêrantî ne hat min ko tiştekî bibêjim, zimanê min pûç bû, çogên min sist bûn û bi tirs ez ji ba çûm û min rêya malê kir toz, kut kuta nava min bû.

Li Holenda û piştî min ziman tewa kir min xwendineke din ji bo kar xwend, bigir ez tenê mêr di nav pêncî jin î de bûm, ta bi mamosteyan jin bûn ji bilî yekî, hema tu dikarî bêjî ew jî jin bû ji ber ew jî Homo bû, şerê min û wî tim li dar bû, min jê re digot:
-pêdiviya vî welatî bi anîna zarokan heye..
Wî digot:
-zarok guneh in, gerek em wan çê nekin..
-tu li ser wan ditirsî ji bo nebin wek te, ma hevalê te heye?, min pirsî.
-na, lê hene yên bazdin ser min û kurmê min bişkînin..

Dema wisa got li ber çavên min bû wek marê reş, û min nema têkiliya wek merovekî xwezayî pêre kir. Axaftina wî Jan ter Horst anî bîra min, axaftina wî hişk û zuwa bû lê ya Jan ter Horst nazik û birêz bû û qoqê wî kewara bîranînan bû, tiştek ji bîra wî nediçû, li ser zaroktiya xwe ya yek salî daxêvî, di nav axafina xwe de gelek caran gotina”merovan bi ji bîrkirinê kêf kirine’’ tanî ziman, yê wî tiştek ji bîra wî nediçû, dema ji min pirsî:
-waar komt u vandaan ? ( tu ji ku hatiyî?).
-ik kom uit koerdistam. (ez ji kurdistanê hatime).
Wek yekî ji min bawer neke dema min got ez ji kurdistanê hatime. Wî got:
- yekemîn car min kurdek li Chicago dît, sol boyax dikir, min jê pirsî:
-tu ji çi welatî hatiyî?, (Where do you come frome ?).
-ez kurd im (bi ingilîziyek şikestî got),
-navê welatê we çi ye?.
-kurdistan e..
-kurdistan li ku dikeve?.
-li nîvê dunyayê dikeve.
-tu ji wir ta bi vir hatiyî dako tu solan boyax bikî?.
-ev qedera me kurda ye, ta niha em rêncberiya merov û merovantiyê dikin, em Tajî ne.
- tu kurdê duyemînî ko rastî wî têm, gelo mebesta wî ji ‘’ em Tajî ne’’ çi bû?
-ta niha em wek tajiyan ne ji xwe re nêçîrê dikin, di pêşerojê de em dibin xwedyê tajî û tajî dê ji me re nêçîrê bikin.

Hingî min pesnê kurdistanê jê re da soz da nêzîk here bibîne û ji min re diyariyekê bîne eger ez bibim hevalê wî û hefteyê carekê bazdim ser.

Çi cara min merovekî Homo didît, min bi qestî li zikê wî dinerî ta ko ji min dipirsî:
-tu çima ewqasî li zikê min dinerî?. Mamosteyê min û Jan ter Horst ev pirs ji min kirin, bersiva min jî di her du caran de ev bû:
-ma tu ne avisî?. Mamostayê min di şêweyê axaftina xwe de de hişk bû û ji ber vê yekê min jî rêz jê re nedigirt. Carekê û hingî ez tengirand im, min jê re got:

-ez merovê Homo mêr nabînim!. Ez bi sedema vê gotinê di dawiya salê de ceza kirim û li ber navê min danî ’’ zor e tev li civaka Holendî bibe’’. Jixwe ji ber vê hevokê ta niha min ceza dikin û kar nedane min.

Di pêşî de min ev yek bawer nedikir, min bawer nedikir mêr, zilam, bavê zarokan û simbêl boq Homo bin, ta ko min ew di televizyonan de dîtin, mêr û mêr bi hev re dizewicin, gustîlkan dixin tiliyên hev, devê xwe dixin devê hev û lêvên hev dimijin. Ko kalkê min sax biwa û ev yek bidîta dê wî jî wek min bawer nekiribiwa, dê bigota: batil..batil..batil..ev çi bê edeb û bê heya ne yaho..dawya dinyê ye. Dema min ew di televizyonan de didîtin min bi tinazî ji xwe re digot: gelo kîjan ji wan dê avis bibe, dibe ko her du jî avis bibin. Ka zilamên berê û ka yên niha, boqê simbêlan li ser wan e û qûnde ne. Hin ji wan zarokan bera ser xwe didin. Dema ez li welêt bûm dostekî çîroka xwe bi efserê xwe re ji min re got, mûyê serê min rabûn, min bawer nekir, lê wî ev yek piştrast kir dema ji min re got ko ew ji ber vê yekê tê xelatkirin û her heftî ji leşkeryê tê malê. Efserê wî jê xwestibû pêre razê, pêşî wî ev yek red kir, lê efser ew bi tawanbariyeke mezin tirsandibû û jêre gotibû ko ew ê wî bi têkiliya bi Israîl re tawanbar bike, jixwe cezaya vê yekê li gor destûra leşkeriyê kuştin e, êdî ew mecbûr mabû ko bazde ser efserê xwe yê ko niha wezîr e, dostê min jê xwestibû ko bi Kondom bike lê efser nepejirandibû. Berî demekê ji min re hate ragihandin ko dostê min li Keneda ye. Wezîr ji bo serdaneke fermî dostê min jî bi xwe re dibe Keneda, li wir derfetê bi dest dixîne û direve ba polîsan û gilî û gazindên xwe bi wan dike û di derbarê çîroka xwe de ta bi derziyê vedike, yekser mafê rûniştinê werdigre, lê berî du sê rojan ji min re hate gotin ko bavê wî yê kal girtine û kirine zindanê ta ko kurê wî vegere.

Min qet bawer nedikir mêr mêran bera ser xwe din, min bi çavên serê xwe nediye, lê min bi guhên serê xwe guhdarî li wan kiriye, her şev dengê wan dikeve her du qulê guhên min, dema bi hev dikin tu dibê qey şer dikin û ji ber dengê wan xew nakeve çavên min. Min berî du rojan telefona polîsan kir û gilî û gazindên xwe gihandin wan, min got ez ji ber dengê wan nikarim razêm, wî got:
-ji mafê wan e, bibore em nikarin tiştekî ji te re bikin.
-lê min aciz dikin?.
-çênabe tu aciz bibî, ko wisa nekin kêfxweş nabin, ev merov in nexweşin, bibore tenê di vê yekê de em nikarin tiştekî ji te re bikin.
Min bi hêrs bihîstok di rûyê wî de girt û min ji xwe re got:
-destê tu nikaribî pê ramûsîne.

Cîranên min î aliyê din jî du jinên lezbiş in, jixwe ko her du bi hev dikin tax hemû li ser dengê wan şiyar dibe, îca ya baş ez mala xwe ji vir veguhêzim, “ne di nav tirban de razê û ne xewnên pîs bibîne...

Holenda
11/11/2005

# Serokê giştî

Yekem Car bû ko sê keçên kurd li hevûdu dirûnên û giftûgoya wêje û rewşa nû dikin, min digot qey jin tenê li ser modêlên cil û mekyac û zêran diaxivin. Dema min çîrok ji Xecê guhdar kir, ji min re tuştekî nû bû û bû xewn û hêvî ko ez li wan guhdar bikim û bîr û bahweriyên wan bipejirînim. Min di nava xwe de guman dikir ko jinên xweşik û spehî tenê dikarin guhdar û hez bikin, tenê ew ji bo mêrkirin û anîna zarok û şuştina sênîkan in, min guman ne dikir ko rojekê ji rojan jin jî di siyaset û wêje de biaxive, her wisa dê giyan û laşê wan hişk û zuha bibe. Wê jî piştgiriya min dikir û digot ko bi tevayî wisa ye.

-Xecê..çi navê xweş û şêrîn,
-ji min ve jî xweş û şêrîn e, kalkê min, bavê diya min li min kir.

Min ew li seyrana Indîwar ya ko hevala wê Şêrîn bi helkeftina salvegera rojbûyîna xwe rêxistibû dît, min jê pirsî:
-te xwe derman nekiriye, çi ecêb?
-çax tune bû.

Du sê caran kir ko çîroka xwe û herdu hevalên xwe bêje û ji bo ko ez ji nêzîk ve wê nas bikim min gotina wê dibirî. Paşî min derfet dayê ko bêje. Carekê em hersê li ba Gulav gihan hevûdu û me ji hevûdu re got ; werin em îro li ser modêlên cil û mekyac û zêran naxavin, ka em li ser serokê partiyan «Ma ka ew roj a kurd li Kurdistan » biaxivin. Min pirsî :
-hûn rewşa helbesta kurdî çawa dinirxînin?
-îca helbesta kurdî ha!! ev çi pirs e keçê..tu fedî nakî tu van pirsan dikî, Gulav bi qerf û tinaz wisan got û berdewam kir :
-helbesta kilasîk bi çûna Cigerxwîn re binaxbû û ya nûjen jî li nivîskarê xwe digere..
Şêrîn: hûn dikarin bêjin serokên partiyan çawa û çilo dibin nivîskar û rê li ber berhemên nivîskaran digrin.?
min bi ken û tinaz got: we kovara “yek dest” ya partiya “Ma ka ew roj a kurd li Kurdistan” dîtiye û xwendî ye..?
Şêrîn û Gulav bi hevûdu re gotin ko wan ne tenê nexwendin e belê hîn nedîtine jî, da ji min xwestin ko ez naveroka wê ji wan re bidim diyar kirin. min got:
-ezê bêjim lê hûn dê ken û tinazên xwe bihêlin dawî dako em bi hevûdu re bikenin.

Li şûna pêşgotinê Serokê Giştî yê partiya”Ma ka ew roj a kurd li Kurdistan” kurtejiyana xwe nivîsandî ye “”ez di sala berfa giran de ji diya xwe bûm, temenê min bû çardeh sal ”yazdeh” hevalkên min hebûn, ez pir xweşik û lihevhatî bûm û ji ber vê yekê ez bi navê Kazanova dihatim bi nav kirin. Min komeleya Xoybûn damezirand û yekem çapxane min bir kurdistanê, civata yekîtiya xortên kurd û yekîtiya jinên kurd jî min damezirandin û yekîtiya nivîskaran jî, belê yekem partî di nav kurdên rojava de min çêkir, di kongirê yekîtiya tevgera kurd li kurdistanê ez amade bûm û kesek weke min neaxivî, belkî ez panzdeh katjimêran axivîm, gelek caran ez bûme nûnerê partiya çep, sê caran ez çûme hevdîtina Berzaniyê nemir û çardeh caran ez çûme Japan, jixwe Tişîlî û Felestîn nayên jimartin, di şewata sînema Amûdê de min bîst û neh zarok ji şewatê rêzgar kirin, wisa jî di Zindana Hisiça de ez pêhlewan bûm, yekem kovara rengînî di kurdistanê de min weşandiye, ez karim bibêjim ko xweda ez diyarî ji kurdan re şandime””. Bû tiq-tiqa Şêrîn û Gulav lê min gotina xwe berdewam kir û got :
Di rûpela yazdehan de Serokê Giştî bi helkeftina rojbûyîna dostekî namekê dişîne û di rûpela 12 ande namekê ji dostekî dî re dişîne, ew dost jina xwe piştî bîst û sê sal û deh roj û heft katjimêran berdide da Serokê Giştî namekê jê re dişîne û têde dinivîse””Delalo tu ne yê

pêşî yî û helbet tu ne yê dawî yî jî ko jina xwe berdidî, ev di ola me de normal e û tu dikarî sibe yeke dî bîne, min ji te re çar dîne, yek ji wan ji Sûdan e, pir esmer e lê tê xwarin ha, xema zarokan jî mexwe, tu dikarî wan bişînî şoreşê yan Tişîlî yan jî Felestîn"".

Di rûpela şanzdehan de namekê ji Rêzan Xisro re dişîne, ((Rêzan Xisro jî endamê komîta navendî ye di {partiya welatparêzên kurdistan} ya hevbend ji partiya "Ma ka ew roj a kurd li Kurdistan"ne, wî diranê xwe yê aqilan rakiriye lê pir êş û elem û werm girtiye, da Serokê giştî namekê bi vê helkeftinê jê re dişîne û tendurustiyeke baştir jê re dixwaze.

Di rûpela bîst û duduyan de hatiye nivîsandin ko mirovekî Nîkaragweyî ev sê roj in xwe di xurîne lê têhna wî naşike û derman û bijîşk jî bi xura wî nikarin da Serokê giştî namek bi vî rengî jê re şandiye""ez sîh û sê salî bûm eynî xura te ez girtim, min tu çare jê re ne dît ji bilî ku gerek min xwe di nav heriya axa sor û hinê de bi çanda"".

Di rûpela bîst û heftan de Serokê Giştî namekê ji hevalê xwe Hiso endamê komîta navendî ya eynî partiyê re dişîne ""wek ku ez dizanim gerek tu jî dev li kuçikekî{ sehekî} har bikî da tu ji nexweşiya sehê har rihet bibî an jî tu dê bibî seh û nabî tu were nav me û civînan ta ko tu wisan nekî!!!!!.

Nameya dî ya ko Serokê giştî bi rê kiribû, ji jineke kurd re bû, sêzdeh keçên wê hene, di dema ku gerek kurek jê re biba beravêt, da Serokê Giştî namekê jê re dişîne û dinivîse""xweda mezin, dilovan û comerd e, bila bahweriya te bi xweda hebe, xêra wî bê dawî ye"".


Di nameya dawî de ko di rûpela şêst û şeşan de belav bûbû bi helkeftina şerê di navbera sehên du gundan de bû, Serokê giştî namekê bi vî rengî ji herdû gundan re dişîne""ez vê yekê rast û durust nabînin, ev gelacî ji Emerîka ye û divê nêzîk ne dûr aştî û biratî bikeve nav sehên we, ez vê yekê şermezar dikim"".

Careke din bû tiq-tiqa Şêrîn û Gulav û di nav ken re bi hevûdu re gotin:
-ev çi serok merokin bavo…min bi zor û heft belan herdu rawestandin û got:
-na welê hîn..hîn bila bêhna we fireh be.. dibin her namekê de jî dinivîse:

Şîşa Tenûrê
Serokê Giştî
Yê partiya ma ka ew roj a kurd li Kurdistan

Cardin bû tiq-tiqa wan û bi hevûdu re gotin :
-em li ser modêlên cil û mekyac û zêran biaxivin baştire ko em li ser wêjeya serokên wisa ezît û nexweş biaxifin.
Ji min re çîrok û axaftina wê pir balkêş bû û ji bo ez li guhdariya wê sar nebim min hez kir ko berdewam bike.
Dema Şêrîn û Gulav ji ken vala bûn, Gulav got:
-keçê guhdar bikin weleh dê quloçên we derkevin; di eynî kovarê de, di jimara çil û sisiyan de Serokê giştî bersiva pirsa danasîna jiyana xwe di hevpeyivîna ko endamekî partîyê pê re kiribû, wisan pesnê xwe dide û dibêje; Ji her çar perçên kurdistanê kurdên Rojava rewşenbîr û jîr û zana ne, û ji nav kurdên Rojava kurdên êla me rewşenbîr û jîr û zana ne, û ji kurdên êla me kurdên li bajarê Qamişlo dijîn rewşenbîr û jîr û zana ne, û ji kurdên êla me ji yên ko li Qamişlo dijîn kurdên taxa me rewşenbîr û jîr û zana ne, û ji kurdên taxa me kurdên celda me rewşenbîr û jîr û zana ne, ji kurdên celda me kurdên mala me rewşenbîr û jîr û zana ne, û ji xwe di mala me de kes ji min pê ve tune.


Cardin bû tiqe-tiqa me hersiyan û em nerawestiyan ta ko diya Gulav derî li me vekir û bi xeyd got:
-dengê kenê we wek ê qereçiyan dighê asmanê heftan, hûn qereçî ne hûn çi ne..???????
25.04.2001 HOLANDA



**Qado Şêrîn**

-tê bîra te me cara pêşî hevudu di imbara we ya genim de dît?
-na ne imbara genim bû, kadîn bû,
-danê piştî nîvro bû û diya te çûbû ser tenûrê û bavê te li meletiyê bû.
-na, bavê min çûbû aş, û diya min çûbû bi hawara jina şivanê gund ve a ko dikir bizê.
-wê rojê birê te yê biçûk biser me de hat û em di rewşek xerab de dîtin,
-na, ew kurê cînarê me bû, li motka mirîşkê digeriya.
-wê carê min şekirekî keremêla da te piştî min devê xwe ji bin guhê te derxist,
-şekirê dilopiz bû, me bi deva dida hev û pêre te lêvên min dimijandin.
-eger tu zanî di dûv re min çi bi te kir?
-te xwestibû bişkokên sînga min veke, lê min nehişt.
-ji bo tu bikenî min derpiyê te î sor kirbû serê xwe.
-devling bû, te ta bi serî kişandibû xwe, ez gelekî keniyabûm.
-şanikek reş di bin serê memka te ya çepê de hebû.
.............

..................................
................


Fermana Han

Ji serokê rojhilat û rojava,
bakur û başûr

Divê ji niha û pêde hûn tenê
vê duruşmeyê «Bijî Serokê me
û bavê me, jibo keç û jinên
me» li şûna ya berê «bijî
Serok Qilçix» bilind bikin.
Ê ji we ji vê duruşmeyê pêve
bilind bike, ewê bê xazoq kirin-
ta ku bimre.

Serokê we û bavê we
Qilçixê Xemxur

22ê avrêlê
Sala 129an

Sema
www.semakurd.net

Qado Şêrîn

Serok û Merok

Sema